
FÊRÎKÊ ÛSIV

# PAMPA MIN

## Berhemên bona zarokan

YÊRÊVAN –2009

**Pirtûk bi alîkariya neviyê Fêrîkê Ûsivî hizkirî**
**ALÎK tê weşandinê.**



**F. Ûsiv tevî neviyê xwe Alîk, s. 1989**

# DIYARIYE JI BO 75 SALIYA JI DAYÎKBÛNA
# FÊRÎKÊ ÛSIV
# (1934-1997)

ՀՏԴ 891.5-93 Ֆերիկե
ԳՄԴ 84.5 Քրդ
Ֆ 474

Ֆերիկե Ուսըվ
Ֆ 474 Իմ փամփը: Ստեղծագործություններ երեխաների համար/Ուսըվ Ֆերիկե .- Եր.: Լիմուշ, 2009.- 96 էջ:

ԳՄԴ 84.5 Քրդ

ISBN 978-9939-805-98-6

ՖԵՐԻԿԵ ՈՒՍԸՎ

# ԻՄ ՓԱՄՓԸ

Ստեղծագործություններ երեխաների համար

ԼԻՍՈՒՍ ՀՐԱՏԱՐԱԿՉՈՒԹՅՈՒՆ
ԵՐԵՎԱՆ – 2009

**FÊRÎKÊ ÛSIV**

# PAMPA MIN

**Berhemên bona zarokan**

**WEŞANXANA „LÎMÛŞ“**
**YÊRÊVAN –2009**

# DERHEQA FÊRÎKÊ ÛSIV DA

***

Min dev-devî nîv sehetê êvariya bo 50-î saliya dayîkbuyîna Fêrîk da xeberda. Min got, wekî wetenhizî, dilkelî, hub, hisret, tebiyet, xiyalêd emir ruhê efrandinê Fêrîkê Ûsivin, efrandin, ku bi mecalêd angor: bi kurmancîke dewlemende bê qisûr û ferih, bi nexş-nîgarê geş, çapêd teqil hatine hunandinê. Şiyêrêd Fêrîk mîna kanîke xweber bilqîn pê bikeve - ji dilê wî dikişin...

... Min Fêrîk hesab kir şayîrê kurdî mezin.

**HECÎYÊ CINDÎ**, s.1984

***

Bi dil û can pêşkêşî Fêrîkê Ûsiv - şayîr û helbestvanê kurdê sovêtistanê yê hêja, bi xîret, qedirgir û wetenperwêr dikim.

**QANATÊ KURDO**, 19.01. 1984, LÊNÎNGRAD
(Pirtûka "Tarîxa edebyeta kurdî")

***

Fêrîkê min, "Çevkanî"- navê kitêboka teye çûke pêşin – ew îda poêzyaye. Her tişt hatiye gotinê... Ew çevkaniye –mizgînî, ji wê çevkaniyê şiyêrên te, ku mîna ava tezeye zelal, sar û xweş, îda dertên-me zef şa dikin .

**EMÎNÊ EVDAL**, s. 1961

***

Demeke dirêje - dîna min lêye, çika çi nivîskarên teze têne dinyayê. Û vaye - ne tenê nivîskarên ermenî, lê yên miletên mayîn jî bin kevira derdikevin wek kaniyên zelal, ku vê lepa axa kal-bavê me ermeniya sitirîne. Aha yek ji wana eve, yekî bi talant, xudanşuret Fêrîke, ku min bi xwe jê tercme kirîye.

Ez di wê baweriyêdame, wekî ew gelekî hêjaye, ku bibe endamê Yekîtiya nivîskara...

**HOVHANÊS ŞIRAZ**, s.1964, (*Helbestvanê ermenîyî mezin :F.H)*

***

Nava edebyeta meda ciyê Fêrîk, destnivîsar-stîla wî dîyar bû. Kurmanciya bêqisûr, pirzanebûna zargotin, erf-edetên me kurda, qedirgirtina her peyîvekê û bi hostatî cîda karanîna wan, fantazya efrandinêye mezin, bi serbestî zanebûna hemû surên şayîrtiyê Fêrîkê Ûsiv kirin nûnerekî edebyeta meyî herî berbiçev....

...Fêrîkê Ûsiv hertim bi derd û kulê Kurdistana xweva dijît û dikewgirî.

**ŞEKROYÊ XUDO,** s. 1997

***

Di nava ezmanê helbestvaniya kurdên Sovêta berêda, ji salên 50-î yên sedsala 20-î û virda çend stêrkên geş yên wek stêrka serê sibê derketin û di nav wanda yeke here geş stêrka Fêrîkê Ûsiv bû.

**WEZÎRÊ EŞO**

## FÊRÎKÊ ME

Fêrîkê Ûsiv ewledekî gelê kurdî xwedî şuret, merîfeta xwezayiye (tebyetî) erhede û mezine... Di goveka xwedîharkirina şayîrtiyêda Fêrîkê Ûsiv, destpêkê girtî heta dawiyê, xwe testîq kir çawa şexsekî efrandariyêyî helal û bi temamî dilvekirî.

...Û şayîrekî mîna Fêrîkê Ûsiv, ku serdapê îsaf bû, helal û temiz - destê hine "şayîr" û "rewşenbîrên" nexwez û nezanda hergav dizêrya-dikewgirî... Pirs ewe, wekî suret- merîfeta ji Xwedê hatî geleka davîte di nava xêrnexweziya tel û terî.

...Naka Fêrîkê Ûsiv wek şayîrekî esilzade bêminet dilive diçe berbi pêşeroja edebyeta kurd û Kurdistanê, poêzîya wî bi taqên xalise kûr û bi xemil-rengên ştavva nitiriye... ew her tenê layîq-hêjeyî hizkirinê û qîmetkirina bilinde.

**ÇERKEZÊ REŞ,** sala 2003

***

Şayîrê kurd û hevalê qenc Fêîrkê Ûsiv ra.Gelê me muhtacê qabilyeta şayîrê mîna tene.

**ELÎYÊ EVDILREHMAN** ("Dê",15. 09.1965)

***

Fêrîkê Ûsiv helbestvanekî Xwedêdayî bû, hostê xebera bedewetiyê. Ewî bi helbest û destanên xwe yê delal cûre, reng û naverokeke nû, bi heqî nûjenîke eslî anî nava poêzya Kurdaye pirqurne. Ji cûrê klasîkî dûr ne ket lê ew bi rê û şopa xweye kûre xwexatiyê xemiland, dewlemend û rengîn kir.

**ESKERÊ BOYÎK,** s.2004

***

Şayîrê xweyê şureta mezin Fêrîkê Ûsiv teql û akleke teze kire nava poêzîya kurdaye sovêtiyê. Hema ji gavêd efrandariyêye pêşinda ewî nexş û awazêd şayîrtiyêye teze xwera anîn, kete nava "crîda" edebyetê, çawa siyarê hespê Pêgasî kihêl.

**BABAYÊ KELEŞ,** s. 1984

***

Ji şikberiyê dere, ku Fêrîkê Ûsiv (1934-1997) sedî-sed ji helbestvanê kurdên Sovyetistana berê yê herî navdar bû...

**TÊMÛRÊ XELÎL,** *s. 2006*

## PAMPA MIN

Pampa mine baş, Pampa min kubar
Wê pal vedaye wan quntarê sar,

Pamp mîna bûka, bûka xeml lê bend,
Dorê çiyayêd me girtine govend...

Çiyayêd me bilind, çiyayêd me kubar
Jê dixulxulin cew û kaniyê sar,

Şimalê mij tê mîna karvana
Ser çiyayê mera diçe arana.

Êvarê bi hewas mij guje-guje,
Û nav mijêda Pamp dihênije...

Pampa mine sar-gulistan Şîraz,
Min jê baq kirin gulêd xweye xas...

Ax, çiqa dixast min hezar guman,
Ku wextê mirin min bibe mêvan,

Cimeta min meytêm şahîrî
Çelbike serê çîyayê Dibûrî...

Ku mija Pampê mîna karivana
Bê û ser minra here arana-

Bîna gulê min,huba dilê min,
Huba dilê min, derd û kulê min

Bibe arana,
Bibe arana,
Bibe arana,
Qurn û dewrana...

## KURÊ MINRA

Car-carna têm melûl, dilxor û mirûzim,
Lawo, kerba bınê lingê te radimûsim...
Şaş nemîne, berxikê min... êh, kî zane...
Dinê heye kaşkişika dest îsane:

**Dive rokê Kurdistana xopan vebe,**
**Bavkê teyî hisret dilda lê tunebe...**
**Bira hingê lingê te bi hisreta min**
**Bigere nav ax - topraxa cimeta min...**

## KURDISTAN

Agir û antêxî tu,
Hew maye – min vêxî tu,
Hal û îlik bêxî tu,
Hey zor û zordesta min.

Lê çi agir, nûrî tu,
Hevdu nafûr-fûrî tu,
Ji hev bela , dûrî tu,
Hey tu rast û qesta min.

Minra hergedayî tu,
Diya min dûr-derayî tu,
Ne li van erdayî tu,
Hey tu erd û besta min.

Ez bilbilim –qal û dax,
Tu sorgulî,dinya-bax,
Li minra venabî, ax,
Hey merem û qesta min.

**Qurn û dewir û sal-zeman**
**Heyrî bengzê te ez mam,**
**Kurdim, kuyî Kurdistan,**
**Wey dîl û bindesta min...**

***

Cimeta min ker-kerî,
Cimeta min ber-berî,
Ax, xwezila li çiya, banî
Ez bibyama cew û kanî:
Tu bihatayî ji her yêrî
Bi hisretî û dilxêrî,
Te ser evê kaniya qudiret
Hevdu bikira sivexêrî…

## EZ Û CIMET

Ez û cimet-
A eve muhbet,
Kilam, şiyêr û saz,
Hunur û hewas.
Ez xezaleke tî li çiya û banya -
Cimeta min –ava serkaniya.

Ez cûcika fira, cûcka kewa –
Cimeta min perr-baske û hewa.

Ez moza hingiv, moza nav şana –
Cimet gula nava kewşena.

Ez mesiyê avê, cimeta min – ber,
Ew okêana kûr, qeyîkim li ser.

Ez keskesora li pey baranê –
Cimet roj û teva aranê.

Ez steyrikim, steyreke geş –
Cimeta min – ezman û erş.

Hergê poêtim û syarê Pêgas –
Cimet minira, meydan û Parnas.
Ez û cimet-
A eve muhbet,
Kilam, şiyêr û saz,
Hunur û hewas.

## MISTEFA BARZANÎRA

Me mal-miletî nekir şîn-girî,
Şîna şehîdiya te Merdemêrî.
Me li roja ava nihêrî,
Wekî ku emir dide rojek din,
Me li toximê şova nihêrî,
Wekî ku zeviya dide gîhandin.
Me li serê wan lawa nihêrî,
Ji kîjanara dibên Barzanî
Û me bi sebirê girî guherî,
Me bi hêsira nekir arzanî...

Bera ew milet hêsira birêje,
Yê ku nikare birêje xûnê,
Yê ku çewdera rizî davêje,
Dixweze gênim hilîne şûnê...

Lê me aqa xûn meydanada rêt,
Wekî em pêda bûne Cegerxûn,
Em bûne Hejar, Şivan, Celaldêt,
Xoşnav, Xêrûlle, Leylê û Mehmûd.
Em bûne lawê wan dayîkê tê,
Ku tûr vedide herke bîst berî,
Û miletê me nav sur û şextê
Ragihîşte bîst mîlîon neferî...

...Belle, serê me ket, lê em nagirîn,
Şîna te nakin, bavê cimetê,
Emê mînanî kurikê dêmbirîn
Bigrîn, bikenin ber hemêza dê:

**Dayka Kurdistan... kengê xwe ragirt,**
**Kengê merema te hate sêrî,**
**Hingê wê nava şaya meye gurr**
**Bihele şîna te merdemêrî.**

**1979**

***

Kurd xerîbdoste,
Kurd ji mileta aqa hiz kiriye,
Wekî navê wan
Bi hewas-heyran
Ser zar û dilê kurdada dijîn,
Gotîye Înglîs,
Romo û Receb,
Kurê xwe ezîz
Navkiriye Ecem,
Navkiriye Ereb,
Ûris û Gêrman.
Û hela Çerkez,
Cahûd, Emîran..

Kurd xerîbdoste,
Her milet û merd
Ser zar û dilê kurdada dijîn,
Lê hene nemerd,
Ku naxwezin kurd
Erda jî bijîn…

## HECÎYÊ CIHDÎRA

*Bona hevtê saliya wî, bi hizkirin*

Ew kî dibêje - hevtê salîme,
Min xitim kirye deh û du sî,
Ew "hevtê-mevtê" kê lev aniye
O li min kirine xewna qazî…

Îda "hobêlyar", îda "emekdar",
Îda "aqilbend", "kana ulma",
Îda "nivîskar", "doktor" û "dersdar",
Nizam çi û çi…na, qurba, na…

Kengê min hevtê berevok çêkir,
Hevtê cildê xurt - xurû çîrok,

Hevtê serhatî-beyt ji ber lêkir,
Hevtê cild kilam, hevtê dîrok,

Hevtê laûjok, hevtê nivêjok,
Hevtê qelîbotk, hevtê qewilik,
Hevtê metelok, hevtê zûbêjok,
Hevtê bend beytê "Kerr û Kulik",

Hevtê berevok kilamê şînê,
Hevtê ya şayê, xêr û xweşiyê,
Hevtê varîyantê "Memê û Zînê",
Hevtê yê "Sîabend û Xeca Zerîn",

"Ûsivê Nevya", "Ûşiv û Xezal",
Ya "Zembîlfiroş", "Xanê Çengzêrîn",
Û hevtê şaxê "Rostemê Zal",
Hevtê pirtûkê şiyêr û poêma,

Hevtê ferhengok, xebername,
Hevtê yê dersa, hevtê yê ulma
Û hevtê pirtûk jî yê tercma...

Û Xwedê ku hat hewara hevtê
Û du mileta, ya me jî tev,
O min nivîsî hevtê "Hewarî",
Hevtê romanê baş û bedew-

Hingê, heyrano, hevtê salî na,
Hiz dikin bêjin sed û hevtê,
Hingê, qurbano, ez jî tevî we
Çi bêjim – bejina siyarê min tê...

1978

***

Dinihêrim ez dayka xwe,
Dinihêrim li bavê xwe:
Kîjan başe, kî bahaye û delalî?-
Ez mêl divim ha vî alî,
Ez mêl divim ha wî alî...

Usa teyr-tû wextê firê, bi firqaskî,
Ha mêl dive ser vî baskî,
Ha mêl dive ser wî baskî…

## DAYÎK Û TENDÛR

Car-carna, wextê ez xilmaş dibim,
Çevê min tên girtin bi teriya gevez-

Ber min birq vetê bengzê dayka min,
Sufetê wêyî xurûyî remxwez.

Berewil dikim çevêd wêye rem,
Xala şîne ser enîyê kutayî,

Dêrê keskî wek belçike kelem,
Dora tendûrê pejal vedayî…

Xweyîngê hevin dayîk û tendûr:
Dû keys-keremê rû-barê erdê,

Ça ji dilê dê, ji wê "çela" kûr
Germ û bereket sal-misal dertê…

Ez xewna xweda diya xwe dibînim
Timê li dora ewê "çela"germ,

Û hişiyar dibim û ez bîr tînim
Çela pala çiyê- qûçe xwelî ser…

Sare ew çela çolêye sade,
Bê kêle-koziye, bê dû, bê dûxan.

Yazix, tendûr jî rind tînê nade,
Çaxê bi destê dê nayê dadan…

## BAHAR

Quling kişyan, çiya xwe hesyan,
Geliyêd kûrîn kirine xuşîn,
Berf hilkişyan, av dakişyan,

Çem xulxulîn, ewir kimkimîn.

Kulîlk şîn bûn û dil şa bûn,
Der û çîman gişk bûn zozan,
Kerî rêzbûn, hevraz hêl bûn –
Şivan, gavan çiyê bûn mêvan...

## BAHAR VEBÛ

Bahar vebû,
Derêm çolê,
Berfa mêvan verêkim,
Qeda salê,
Xema malê,
Kul û kovan verêkim,

Birrê berxa
Berdim palê,
Kerê şivan verêkim,
Xewneke xas,
Berxvankî xam
Bi tûr-hevan verêkim.

Çiya şîn dikin,
Gultim-gultim
Herim, herim hevraz bim,
Belekîkê
Heta ya din
Li "du dinya" derbaz bim.
Heyra dila
Bikim kilam,
Karvan-karvan verêkim...

***

Zefî hiz dikim ewilê baharê
Çaxê ji çiyada karxûn tê xarê,
Çaxê kelekel dikeve erdê,

Xam hêşîn dike û binevş dertê.

Belekiyê berfê xwe didin hewraz,
Li jêr diçêrin kerî-sûriyê pez...
Qelfê qîz-bûka
Dertên gêdûka,
Komê zarr-çûka
Diçin pîçoka...

Çivîka li ser baharê bengî
Distirê, dikare bi hezar dengî,
Qûrtîn dikeve teyrê atmece,
Jorda dinhêre li serê heçe
Û cara ewil ewirê nîsanê
Kel digirije li ser zozanê.

## ÊVARA ADARÊ

Êvara adarê
Qarxûn tê xarê
Û dike xuşşîn...
Hewa çîk saye,
Steyrika penc daye
Li ser rûyê ezmîn...

Li jor tê xanê
Steyrika mêzînê
Û rêça kadiz.
Li ser milê çîya –
Belekiyê berfa
Û hewa temiz...

Û ji dûrecî
Rûviyê qolincî
Dike waqînî...
Tê ji kuleka
Dengê çêleka
Û golikê virnî...

Û li ser darê
Pûpiyê biharê
Distirê – tû, tî...
Selam te tebyet,
Selam te tebyet,
Cineta rastî...

**BAHARE**

Bahar dîsa bi bîna xweş
Hezar rengî li me vebye,
Bi gul, gîha, kulîlkêd nexş
Deşt û zozan xemilandiye.

Ji şabûnê teyr-teyrede
Ber bi çiyayêd me hatine,
Şivan, gavan bi kerîyêd xwe
Ber bi eyla hilkişyane...

**ADAR**

Adar, adar,
Meha xedar,
Te xeniqand
Gîzik û kar,
Li serê rê
Sermê, surrê
Ga û gamêş
Dane qirê:

Hirça şkevtê
Derket deştê,
Ba û berfê
Dane piştê.
Îsan xapya,
Derket qapya,
Li te bawer,

Lê bû bager...
Adar, adar,
Meha kardar,
Tu risqvêran,
Tu dewî dar,
Te hat "Zerzan"
Û çêlek zan,
Serî ket pêz
Û bûne rêz
Berx û golik,
Zara xarin
Dew û qalik..

Li hev rabûn
Berf û qarxûn,
Bi berekî
Bûn belekî
Li best-beyar,
Û bûn dîyar
Binefşê reng,
Buhurrê teng.

Çevê şivîn
Ket sirtê şîn,
Û ser dara
Mîna cara
Xweş hat dengê
Hechecoka,
Û qîz - bûka,
Zarr û çûka...
Xişpîk hildan,
Çûn pîçoka.

**DEWATA TEBYETÊ**

Mîna rûviyê dewatê,
Ba hat cab da tebyetê,
Bax hejya got "bimbarek",

Erdê xwe dît tivdarek:

...Û her tişt bû tundurist,
Ewira def û zurnê xist,
Birûsk mînanî siyara
Pekya ber bi beyara.
Dûman bûkê bû xêlî
Û dakete ser gêlî,
Hingê erdê û ezman
Hatin û hev ramûsan.

Ji şabûna ro derket,
Keskesorê girt govend,
Teyr-teyreda li vira
Şabûna dil istira...

Pey dewata pirr giran,
Li her zozan û aran
Meh derbaz bûn, roj serda –
Erd xemilî û ber da.

***

Hewa xweş bû, şliyê vekir,
Bilbil bêxda çikçike.
Ro mînanî qîzek bikur
Erdê nexşa çê dike.

Diwîrwîre dengê teyra,
Hewa şûştye û miştî,
Meriv hisret, meriv heyra
Çol û baniyê buhuştî...

Çiqa xweşe hisreta gurr,
Li hespekî kihêl syar,
Tevî qelfa heval-hogir
Bigerî best û beyar.

Temaşekî der û doran,
Hildî bîna cinetê,

Dilê te jî bi gul, rihan
Tijîbe wek tebyetê...

## DARA BAHARÊ

Xwe rind ragirtye
Dara beharê.
Dara baharê
Ketye benga xwe,
Qend û qirarê.

Çiqilê terr, cahil
Dikin xilebil
Bi zimanêd şîn.
Lê çiqlek kerre,
Çiqlek ne terre
Û nake xişîn.

Belg pêva tune,
Reng pêva tune,
Ax, çiqil mirye.
Lema fem nakim
Sewta çiqilê din
Kene, yan giriye?

Wê fem nakim, na,
Lê rind fem dikim
Dara baharê:
Ewê bi heyran,
Bi hisreta dil
"Cinyazê" çiqil
Ragirtye ser mil.
Û naxweze ku
Çiqil bê xarê,
Çiqilê mirî jî
Evê baharê...

***

Dîsa gulan gelyara hat,
Ba bîneke xweş bela kir,

Hîv ji milê Miskîn hilat,
Li çayîra çem qela kir.

Dengê beqa xweş-xweş raçiya,
Ça fîqêxin şivanê çiya...

Qey bê, ne sî salî berê,
Li vir çend seheta pêşda

Pez guhêrê da mexelê
Kurikekî qamçî destda.

Şivanê ap tas hilanî
Û kete ber mîke hirrik,

Te tirê hîv jorda anî,
Danî orta xwe û kurik.

Wan firre-firr şîrê germ xist,
Du nana ser hevda anî.

Paşê şivan ttûn derxist,
Kurik ser pot serî danî.

Bala xwe da siteyr û peyra,
Ew arîka wane, qey bê,

Wekî diya wî hewas, heyran
Diniqişand şeva eydê...

Hîv "kuleke"... tîrinca nûr
"Dolîdanka" ji hermûşe,

Daketye ser wê gola dûr,
Ku dibiriqe nolî şûşe.

Kurik kete nav mitala,
Kete ewê "dolîdankê",

Bê nerm hejand, beqa sitira,
Û ew raza ta berbangê.

## ÇIYANO

Bahar vebû, koç milmilîn, çiyano,
Dilê min jî kire kalîn, çiyano,

Da pey keriya, we hilgerya,çiyano,
Selam wera, sebax wera, çiyano.

Ez sî salî hêlanê we geryam, çiyano,
Bi bîna we, rengîna we biryam, çiyano,

Dîsa-dîsa we têr nebûm, çiyano,
Dîndara we zivêr nebûm, çiyano.

Min çil kaniyê we av xarye, çiyano,
Xwezî yek wan bibya avilheyat, çiyano,

Min bijîta şivêta we, çiyano,
Nemama heyr-hisreta we, çiyano.

***

Çingilêd çiyê li ser hafê
Dêmcewikî mêl bûbûn ser,
Qey dêw rûniştibûn kêfê –
Kaxê tijî şerav li ber...

Rapelikî bayê bêşerm
Gerdena gul-gîhê hêşîn,
Xwe xurdilîn gulêd rûnerm,
Ji şermana kirin wîşîn.

Deng dakete best û bêlan,
Dinya bû hub, bîn û buhuşt,
Û şivanê cahil-cîwan
Kesereke kezix rahişt...

## ÊVAR

Cêrê şemsî zer
Danizilî ser
Bera nûr-neder

Ji milê heça.
Tîrinc temirîn,
Bahork buhurîn,
Kerî hêwirîn
Li berpêşa çiya.

Şivanêd zilam
Danîn sifra nan,
Bi hewas pêçan
Balolêd hoça.
Bizinê nese no-
Pezeke xerîb,
Derd-kulê navno-
Dilekî wehîd
Heta şebeqê
Dane ber qoça...

## EZ XWEY DIKIM

Zidbûyî ji hevaltiya hulikar,
Ez xwera xwey dikim hijmekar
Birre dîk-mirîşkê reng-rengî:

Yek çîle qerqaşe, tîne bîr
Gultimê berfa der biharê,

Yek zîlîya amojina mine pîr,
Yek-rengê hingilê hegarê.

Yek reşe mîna siya neqevê
Kumikê sor xaşxaşke li hafê,

Yek xumira dorbenda xevxevê -
Werq dide mînanî alavê.

Dema ku distirên, diqingin
Dengbêjê bêtulim-tembûr,

Qasekê can dibe ruhê min
Bi sidqê zarutiyê gul û nûr.

***

Vê êvara dînc û kerr
Bala min ezmanê gerr,
Çar hewarê berda perr,
Çiya û baniyê dûr.

Va kenarin çiya banî,
Erş-ezmanî xwe kanî,
Hîv tas şîrê nav danî,
Isteyr – xişirê hûr.

Usa xweş tê dengê bê,
Ji mitala û hubê
Hijmekarî, tê qey bê
Saze yan bilûr...

Rast bilûre diguje,
Kanî qey bê dikişe,
Şîr pel bûye dirije,
Ka şivanê nûr?

***

Sirsûmê diya mine ezman li hêlanê,
Û ewirê kirkişî – toxavka kildanê.

Cenûb û şimal jî palikêd sirsûmin,
Bi milê dayka min qewat û qudûmin.

Gurîn ket, şingîn ket "azixê berkelê",
"Dayka min" kesirî, firk kete navmilê,

Û denkir toxavka sirsûmê zimzimî,
Dinya bû sîtil ber, erdê dew parzinî...

***

Teva sore serpûpûş
Mîna kêrek dure tûj
Nav ewirada bû xurûş

Qulbêda çû xar.
Ewirê sore ber-berî-
Bûn zeveşê ker-kerî,
Ezman binda lengerî-
Herçar qulba bar.

Teriya nevsek mîna elk,
Zik daketî ac û felq
Da ber geza xar.

***

Ezmanê bi steyr xitxitî-
Ça parzûnê şîn pitpitî
Mezin, bêhesav...
Hîva şîvxarî gulover
Mîna serî penirê ter
Dixwêne li nav...

## ELEGEZ

Elegeza min mîna deveke bêhed, bargiran,
Bê tog û dizgîn wê xwera îxbûye bi qurn û dewran,

Herdu heçêd wê mîna gurmikê pişta vê devê
Kawik û kubar dûrva dixwênin rojê û şevê,

Û gul - gîhê wê mîna têrr-xurcê pişta devê bar
Bi hezar terzî, hezar awazî daketine xar.

## GELÎ ÇIYA

Hûn miskenê gul û gera, gelî çiya,
Selam wera, sebax wera, gelî çiya.

Zef geryame li bêlan û qaşê we,
Ez jî bûme hogir û taydaşê we.

Min jî serê xwe mînanî serê we

Daye ber ba, birûsk û bagerê we.

We ber pê min gul û gîha raxistiye,
Lê qe çendik-çend birûska min xistiye...

Û kenyame, ez kenyame dil û can,
Mîna gul û sosinê we tor-mircan.

Hûn dê bûne, hûn dê bûne, ez- dergûş,
Li hafê we firîme wek qereqûş,

Û min danye nava konê kurmancî,
Bûme bengiyê qîza bikure tûncî.

Dota kurda hiş min biriye, gelî çiya,
Avliheyat min we xarîye, gelî çiya,

Hersal hûnê vegirin hêşîn, gelî çiya,
Û ezê jî wek we bijîm, gelî çiya?

***

Esirê mînanî dayika dergûş
Şemsê nûr daye milê xwe, diçe.

Tevna kerasiyê hêşîne hermûş
Sînorê çiyêva berjêr radiçe.

Ba difîtîne qeydekî yekhang,
Nêktara gula dalêse nevsek.

Tîrinca royê kirye dolîdank,
Xwe têda dikilê çivîka zevzek.

Kala ber dîwêr serêd xweye sîs
Dane ber rema teva derengî,

Dadigerînin rojêd xwe ezîz
Bi şinga-şinga tizbiyê reng-rengî.

Çiqas bedewî, şîrinî, dinya,
Dixwezim bêjim hetanî –hetê...

Eşqî te bi sitran dişxulim, dinya,
Û emirê min usa ser hevduda tê...

## PAYÎZA GEŞ

Tuyê bêjî teze bihar tê,
Tuyê bêjî teze yar tê,
Ax, hêwirza çivîka
Usa hewas û hişyar tê.

Kerî kundirrye berpalê,
Zevya payîze şîn dike,
Rûvî li hafa newalê
Kuna kêwrîşka bîn dike.

Cewa cinetê berwar bye,
Ada ajirûda gêrre,
Teyr dora têlêva tarbye,
Xwe di cewêda dinhêre.

Hîv heyrî rozgara îro
Met maye û naçe ava,
Ro li hema ezmanê îro
Dikene wek zara sava.

Li ber vê nedîr û tîrincê
"Hevtêmanat" û "Qemerdax"
Nolî du birê qazancê
Li hev dinhêrin sidiqê sax.

## WEXTÊ DAGÊRÊYE

Erd îda gewir bûne,
Pez îda stewir bûne,
Wextê dagêrêye.
Kanî nihicîne,
Teyr-tû xaricîne,
Berê koçê rêye.

Zaru naçin çola,
Ser delav û gola
Û navêjin "peşkê",
Qîz-bûk betal bûne,
Bê xem-xiyal bûne,
Kila nadin meşkê...

Hê bihar bû, bihar,
Kerî dihatin xar,
Girmîn li çiyê dihat...
Roj çi zû çûn, firîn,
Ewira nekir gurrîn,
Dengê cewê hilat.

Îda qîzê neçin,
Ax ezîzê neçin
Ser cewik û kaniya,
Û bilûra şivîn
Wê xweş neke guvîn
Serê çiya û banya...

Ciyê bilûra şivîn
Bayê bagera dîn
Wê gujînke qalim,
Kaniyêd qîz û bûka,
Warêd bindarûka
Wê berfê bên girtin.

Çiyayê bê kes bivin,
Bê deng û hes bivin
Ta biharek teze -
Wê bê bayê berriyê,
Wextê av û heriyê
Çiyayê xwe bihese.

Û tebyeta mezin
Wê bê careke din
Biharek nûh veke,
Lê cara me diha,

Bihara me diha,
Diha ne ew yeke.

***

Wextê beranberdanêye, ax li kume ez...
Pez-berxê min xemilîne bi sor û gevez:

Kerê şivîn binya gunde, berxvanî li bale,
Xemla berîn çiqa rinde, malda kalekale...

Rêncber kerya lê badixin, hîvya zedane...
Zed hazirin, û kêf-kêfa qîz û gedane.

Û bêsebir beranê sor dertê ji hundur,
Û kevanî dide pêşiyê, li pey – qîz û kurr.

Û keleşê minî delal datê nava pêz,
Li ber şivan û berxvana zed dibine rêz.

Xozana nan dibe mîna sifra têr-tijî,
Dixwun-davên, leber dike kelbê şivîn jî.

Gedêd biçûk nan loq dikin û nava ada
Dor kerê pêz çapik-çeleng didin tirada...

Û geş vetê rengê deşta wek bengzê qîzê,
Serda zerr-zîv dibarîne teva payîzê.

## BAGER

Zîwa-zîwa darêye
Digirî mîna sêwî,
Gurînya bagerêye,
Davê çevê rêwî.

Rê çetine, rê şepe,
Merîya qudûm dêxe,
Pêşiyê çele û tepe,
Hal û qudûm dêxe.

Tişt nake…
Ger pêşiya te
Heye besek xêrê,
Xezev be jî, tê ese
Bigihîjî yêrê.

## BERANÊ QERQAŞ

"Qaş, qaş, qaş-qaş...",
Ka beranê qerqaş?

Çi xweş bû wan çola,
Ser derav û gola,
Berx diketin kêşê,
Qaşo dida pêşiyê
Û tewil digirt li sirt,
Berxa dorê digirt
Mîna hîv û siteyr,
Ez lê hewas û heyr...

Û koloyê renghîv
Hey min dibû teglîf.
Min qewiz dikir once,
Simlê genim û ceh,
Li ber digirt, wî zû
Leber dikir diçû.

Yan wexta min cara
Qerxman dida ber ba,
Ew dihate bi rev
Û me dixar tev hev...

Û min digo: - Hirr tel,
Herdu guhê wî bel,
Dihate min bê tirs,
Û çevada hê pirs,
Wekî "rast, yan qestî?"

Bengizê min guhastî
Wî fem dikir yekcar

Û guh danîne xar
Mîna guhê tariş,
Dêmek eme bariş,
Hev ne xayîn, dijmin...

Ew dûr diket ji min...
Û hê diçe, diçe,
Hê ez divêm – çeçe,
Qaş, qaş, qaş-qaş...
Ka beranê qerqaş?"

## QÛLINGÊD BERRIYÊ

Qulingno, berrîyê hûn tên,
Ca çiqa heyra weme...
Dengê we şîrin dibhêm,
Motacê seyra weme.

Wê çibe, vê sala nûh
Hûn riya xwe bixalifîn,
Neçine derez û dûr,
Bên daynin der mala min.

Ez perr û baskê wekim,
Ev avê zef li we bê...
Ez gaze-gazê wekim,
Ev tevê zef li we bê...

Bona we, cûcikêd we
Ezê nan, xurek daynim,
Li serê darê dulme
Hêlînêd fire daynim.

Tek hûn bên, em tev bijîn,
Ez bengizê we mêzekim,
Hûn têkin qingîn-qîjîn,
Dengê we ezîz sehkim...

Qulingno, hey wax, hûn çûn...
Êwir nebûn vî miskenî,

Dilkê min wera hêlûn,
We nehat lê danenî...

## ÇIYAYÊD PAYÎZÊ

- Hey çiyano, çiya, hey çiyano can,
Gul-şîdanê we kuda çûn?
Kulîlkêd we lal û mircan,
Lal-mircanê we kuda çûn?

Qûrtîn diket bet-bazê we,
Şivan distira li gazê we,
Pez hêl dikir hewrazê we,
Xam-xozanê we kuda çûn?

Cew û kanya dikir xulîn,
Qîz û bûkêd benge gulîn
Derdiketin kon û kulîn,
Zom-zozanê we kuda çûn?

Çyano, bêjin, ka nexşê we?
War-mikanê we kuda çûn?
Ax ez digirîm bo rewşê we,
Rewş-rihanê we kuda çûn?

Çiya gotin: - Were megirî,
Hey maşoqê sax û sexîr,
Eve, ev sal çû buhurî –
Wê me şîn bin mêrg û çayîr.

Teyr-teyredê meye xerîv
Wê bên çêkin hêlînê xwe,
Koçerê bên şax û şeqîv,
Wergirin kon-kulînê xwe.

Emê şîn bin, şên bin car din,
Bixemilin sal û zeman,
Lê gelo tê hebî hertim,
Ku xemla me têkî kilam?

***

Carekê jî hildim
Dar û hevanê,
Derêm "Davanê",
"Dibûrva" ta bim,
Carekê jî tyabim
"Gera qurbanê"...

Cewa cinetê
Carkê jî sehkim,
"Tûjikê ziyaretê"
Carkê mêze kim,
"Kevirê Kororra"
Carkê qisekim,
Gezgezka gelyê
"Zyaretê" xwexim,
Ji "Kanya Mîrze"
Avekê vexum...

Paşê, zivistan,
Tu berra xwe sar
Ser çol û banyê
Meda bibne xar...

## ZIVISTAN

Zivistanê kirye rikêf,
Dakutaye der tam û taş,
Lê ay tera nexş û ecêv –
Ne me tirse û ne talaş.

Berfê girtyê çiyayê Dibûr
Û tê xarê mîna sala,
Ne dikin xem, ne pûrepûr
Kevanî û malxuyê mala.

Û wê çira bikin gazin,

Yanê talaş, tirs û minet
Û şa nebin çûk û mezin
Vê rozgara xweşe cinet?

Ne koxikê wanî binerd
Wê têkeve binê berfê,
Ne kêmasî, kovan û derd
Wê wan bidin zor û cefê.

Ne Qeymesê bê ar-arvan
Wê çilleda bide ser rê,
Ne Dirboyê bê çar-guman
Wê qurbetiyê vegere bê...

Ne Sebirî wê here gunda,
Êmîş bîne bona nexweş
Û ne xwexwe sermê hilde,
Bive para mirina reş.

Ne wê Husê kurê Hecî
Devo hilde mal derê der,
Ne peraniya gurê birçî
Rastî wî bên, bavêne ser...

Zivistanê kirye rikêf,
Dakutaye der tam û taş,
Em bi tivdîr, bê tav û têv
Ne dikin xem û ne talaş.

## SIVA ZIVISTANÊ

Kew dibe kerr-kerr tasa ezmîn sût,
Elegez dibe sêxca dürr, yaqût,

Li berpêşa çiyê mirêxa mijê
Dimelise ser kelefêd kurşê...

Şems hêdî hiltê, Dibûrdaxê som
Zer dibe, mîna şîrê rûzihom.

Di bin lêvêda zoxale sya terr-

Bi kubira qerqaş beşervetê gerr.
Mînanî xewin û mtala çûka,
Gultima kewa difire dirûnga...

Dû dibin sitûnê mermere hêşîn,
Hildikevin ber arîka ezmîn.

Tev dilîze tevî şêbiskê Şurê,
Dil mîna çivîk, xweber distirê.

***

Ax, çivîkêd çûktiya minin,
Danîne ser pencera min:
Ew birçîne, bê nan-avin,
Tijîne dîz, tencera min.

Ça dixwezim nan bidimê,
Sitar bikim û çar bikim,
Gazî dikim-nayên hundur:
Ditirsin "kêr, xencera min"...

## KALIKÊ ZIVISTANÊ

Îsal ji Mars û hîv hatye,
Qey nava zêrr û zîv hatye
Kalê rûdanpûs.

Çarmêr danye çiyayê fêzê,
Lal û tule li hemêzê,
Çev li rast û dûz...

Law ber dêrî dikin gazî,
Wekî xarbe wî hewrazî,
Kalo derda bê...

Kal hatye bi qal û bale,
Qijevija zarr, tifale
Li dora keko,

Pêxistine caw û xeber
Ji mal û hal û dor û ber
Bi yeko-yeko...

Kalo dibhê û dikene
Derdixe gûz û kestene
Par dike li wan...

Divê: "Çûkêd mine delal,
Raste ezî extyarim, kal,
Lê kî ku derê dew û şerra,
Li çol û besta,

Ezê bikim surr û seqem,
Biarînim qam û qedem
Wan ling û desta"...

***

Edilî bîna bagerê û bê,
Beşerek bedew hate rûyê qulbê,
Nolî xêliya çîl ser serê bûka
Biriqî berfa gaz û gêdûka.

Mirêxa mijê mîna birrê pez
Mexilî li ber pêşa Elegez
Ber dîndara şems ewirêd gewrax
Heliya li serê çiyayê Qemerdax.

Mîna werdeka bi gul timayî
Sovayî kirin li erşê sayî,
Lê li du wana bi heyr, bi hewce
Dilê min firî mîna atmece...

## DÊWÊ SIPÎ

Dêwê sipî kumkoloz
Syar bû hespê xweyî boz,
Ajot serê çiyayê tîk,

Hêle kire fîke-fîk:

"Ew kye ketye berga min?
Kê pez berda mêrga min?
Ew çi hirçe wê palê?
Ew çi bûme ser darê...?"

Got, qamçiyê xwe batinî,
Bakir, bakir, bir-anî,
Yek li guhê şivîn xist,
Yek li guhê gavîn xist.

Da dû hirçê, kir delê,
Bûm qefiland kir çelê,
Qaban ajot qamûşlix,
Xezal xiste mêşê six.
Gurê topal kir kendal,
Qulincî kir rûviyê kal,
Kêwrîşka pîr xeriqand,
Bizina kûvî teriqand,
Kerî, sûrî kir goma,
Tik û tenê ortê ma.

Îja zûkya nolî gur,
Mîna pûpya gazî kir,
Girya mîna lelewîn,
Wek pişîka kir mewîn,
Fişya-kişya çawa zîya,
Vegevizî nolî sa.

Lîst, reqisî û axir
Xwexwe ji xwe serma kir.
Dakûta gund leylacî,
Kutan derî û bacî.
- Teq, teq, teq, teq...
- Ew kiye?
- Dêwê rûdansipiye...
Derî veke, kevanî,
Binhêre min çi anî...

Qend û şekir Ji Dîyarbekir...
Birincê çîl
Ji Çîn-maçîn...
Min ber dêrî kirye lod...
Bikşîn hundur kod bi kod,
Malêra sal donzdeh meh
Bike pelaw, mastewe...

Inka Hotê wa gotê:
- Serê Huto,
Serê Quto,
Çewal birinc, yek şekir
Me duh li mal peya kir...
Tu birinc û şekirê xwe
Xwexwe çêke, xwe bixwe...

- Hû, cedû,- dêw gotêda,-
Çi bêreme, bê xuda...
Got, derê dadayî hişt,
Lodêra kir qişte-qişt:
- Kanê... ka... ka...
- Hanê, ha...
Û vir hilda gurz gîha,
Bir avîte nav kendêl,
Kevir, hestê xwe jendê,
Pîşo geşkir û birê,
Hê vêneket, puf kirê:
"Puf û ha puf... tû, ha tû"...
Ne bû alav, ne bû dû...
Pihînek da kuçikê xwe,
Wan dera kir derexe...

Lê hingê çend qîz û kur,
Derketibûn ji hundur,
Li der malê, ser xanya
Digotin û dikenyan:
- He... he..., dêwê arode
Kuçika nizane dade...

## BERF

Hat bi ken û eşq,
Danî çîya û deşt,
Bi fîtîna bê
Cî rabû şipê,
Reqisî bêxem...
Tevê penc veda,
Şemaqek lêda,
Rûnişt û girya,
Hêsir bûne çem...

***

Îşev dîsa paşla we bûm, hey gidî çiyano,
Çira usa hun bêwa bûn, wey gidî, çiyano:

Ne bahar bû, ne havîn bû, hey gidî, çiyano,
Hûne ne gewir, ne jî şîn bûn, wey gidî, çiyano.

Usa betsar û bêruh bûn, hey gidî,çiyano,
Qey bê cineta Mîrmeh bûn, wey gidî, çiyano.

Hel û bela dilê min bûn, hey gidî, çiyano,
Qey hûn barê milê min bûn, wey gidî, çiyano.

Ezî hişyar bûm, ne raza bûm, hey gidî, çiyano,
Qijik dor min perwaza bûn, wey gidî, çiyano,

Dikirin çevê min derxin, hey gidî, çiyano,
Sîngê we reş- don li ser xin, wey gidî, çiyano…

Lê dîndarê we ne ez bim, hey gidî,çiyano,
Gelo kîbin, wê çi kes bin? wey gidî, çiyano…

## ZARARA

Xwezilya min we,
Hub-hewasa we:
Hûn çawa bi dil,
Bi hiş û aqil

Xweliyêra şane,
Heriyêra şane,
Tevêra şane,
Avêra şane.

Çîrokekê hûn
Seh dikin hewas,
We tirê hûn bûn
Egît û mêrxas,
Hîvê divînin
Hûn di nav xewê,
Radivin digrîn
Û dikin dewê...

Ax, biçûkê min,
Rindik û êgin-
Ez jî mîna we,
Bal û dîna we
Xewna divînim
Bi heyr û metel
Û dilûvînim
Û digirîm bi kel
Bona çiya –banya
Cewik û kanya...
Lê ku şyar divim
Îda sar divim,
Lê ku şyar divim
Ez saskar divim.

***

...Ez awqa zaru hiz dikim.
Ew tên, em bi dil
Dikin xilebil.

Ew divên:- Xalo, gelo fîl zore, yanê bêgêmot?
- Fîl, ne bêgêmot.
- Avto zû diçe, yanê balefir?
- Hilbet, balefir…

- Lê gelo mirîşk û kêwrîşk şer kin,
Kê-kê alt bike?
- Welle çi bêjim…
Lê ew divêjin:
- Hergê şuxul bê şerê nukula,
Kêwrîşkê banzdin, bikevin qula.
Lê ku dirana bidin xevatê,
Mirîşkê hingê bêne berbatê…

…Û em xwera wa hêdî û rehet
Dikin misilet...

***

Her berbang û şebeq
Dilêm dibe şeweq,
Gava teva sivê
Pencerêra davê.

Her berbang û şebeq
Gava ewirêd neheq
Xwe davên rûyê royê,
U ro piş dernayê,

Hingê dibim kêfxweş,
Ku zara min dêmgeş
Dewsa teva şerqê
Bêşîka xwe dertê…

## NARA MINRA

Her sibe, hertim
Xewê radibim,
Porê xwe li ber
Eynê şe dikim,
Û, hew nişkêva
Jêr mêze dikim:
Şîrin û delal,

Bêsûc-bêgune
Şikilê neviya min
Minra dikene...

Ez xwe bîr dikim,
Ez xwe berdidim...
Ez Nara xwera
Xweş xeberdidim...
Narkê paç dikim,
Narkê hiz dikim,
Toza ser porrkê
Wê temiz dikim
Û bi porê xwe
Neşekirîva,
Ber û pêsîrê
Xwe vekirîva
Nizanim çawa,
Bi çi teherî,
Ez sahil, sivik
Dertêm ber dêrî...

***

Narê, Elo û xalo
Çûne sîrkê tev pîrkê.
O, çi eşqe wê derê:
Dîko syarbye ser kerê,
Kûço, pişo û bizin
Tevî hevdu dilîzin...
- Lê ka kêvîşk, ka milîşk?-
Got Eloyê porkurîşk.
- Li gundin, got, birê can,-
Xûça wîye dilovan.

Silametî em çûn gund,
Emê wana hînkin rind,
Bera ew jî bilîzin,
Awa banzdin, bibezin...

***

Naha emê tevî bûkê
Zoro verê bikin sûkê,
Bera bikirin bona Narê
Bîvokekê û hinarê,
Elora- du totikê germ,
Lê kalkora-çend sêvê nerm...

***

Esil, ew çiye destê kalkoda?
Nav kaxezê req-reqoda...
- Şokolade!
- Marmêlade!
- Na, êmîşe!
- Na, kişmîşe!

-Ne ew, ne ew, ew kateye,
Katê pîrika Firîdeye.
Kêrê bînin ker bi ker kin,
Ser çar para beramber kin:
Yek Nakêra,
Yek Elora,
Yek pişora,
Yek kûçora.

## NEVIYA KALÊ

Kalê qirinte xwe serqot kirye,
Les li dor hona fire lod kirye,
Mîna beraşa têda dizvire.
Lê binatara hona wî fire

Nevînga wî çûk
Dike kûke-kûk.

"Ew kê Narê eçî kirye?

Kê Nara me paçî kirye?”-
  Kalê lev tîne,
  Xwe dihejîne,
Hona xwe dibe derdixe sêrî,
Tê ber bi neviya xweye hizkirî.
  Dezmala tifilê
  Sêrî êxistiye -
Kaş-berkaş dike bayê bengzade.
  Lê ewê dezmal
Hişkem tetikê xwe çûkda girtiye:
Digirî, diqûje, bêva bernade…

Beşer dişxule mîna pirtî ro
Li ser sufetê wî meriyê berê:
“Welle,-dibêje,- kevotika kaliko,
Qîzeke xîret wê ji te derê”…

## XÛÇ Û BIRA

Li kenarê gundî jêrîn
Xûçek û du bira dijîn,
Porê wana similê zêrîn,
Çevê wana binevşê şîn.

Xûçê yeke xase, jîre,
Û Xasêye navê xûçê,
Navê birê yek Mişîre,
Yek Mêlsîke: du şêrê çê.

Li ber dêrî şa û razî
Ew dilîzin “peşko-guro”.
Xûçê bîrde dike gazî,
Divê: “Birê, guro...guro”...

Mişo dibê: “Hella, hella”,
Mêlso dibê: “Hoce, hoce”...
Û ji hinda çemê “bella”
Rûvî direve û diçe.

## DIBÛRDAX

Hey tu, Dibûrdax, birakê mezin,
Rojê rebê min çi zû dibezin?

Çi lez difirin teyrkî meh û sal...
Li ber pêşa te fûr dida fesal

Zeviya payîze...Simlê yek buhust
Li ser serê min dikrin piste-pist...

Nizam, ji sura kîjan cinetê...
Lê min baq dikir kulîlkê ketê.

Bejna min biçûk-gedê guhê gund
Unda dibû nav payîzê bilind...

...Awqa sal çûne.Dewsa gul-gîha
Şiyêr û destana baq dikim naha.

Dewsa wê zeviya li kenarê gund-
Şaneşînê min hilketiye bilind.

Himber dilîzin neviyêd mine nûr.
Bera bighîjin bê keder, bê mûr,

Zar-zêçê dinê-alemê, rebî,
Usa jî herdu çûkêd me sebî.

## ELEGEZÊRA

Ey Elegez, hisreta nûr,
Xewna mine nexş û naz,
Tu xêr-xizna Varpêt-şarur,
Tu têxeke zîv, almaz.

Refed ewira giran û gurr,
Koç bûn ji haf, milê te,
Erş û ezman bûn tasê durr,
Danîn ser gongilê te.

Heçêd teye berf lê koloz,
Mîna kalêd zemande,

Ling dahiştî gelî-geboz,
Fikir dikin hafê te...

Xwezil, çiyano, bahor bim ez,
Bibim teyr-atmecê te,
Per-baskê min heyr û hewas,
Bifirim bêm heçê te.

***

Elegeza min mîna deveke bêhed, bargiran
Bê tog û dizgîn wê xwera îx bûye bi qurn û dewran,

Herdu heçêd wê mîna gurmikê pişta vê devê
Kawik û kubar dûrva dixwênin rojê û şevê.

Û gul-gîhê wê mîna terr-xurcê pişta devê bar,
Bi hezar terzî, hezar awazî daketine xar.

***

Egrîdax dûr ber çevê me
Mîna kon û birc tê kivşê,
Fîla mezin û ejdehe
Serê mêşe hirç tê kivşê,
Qulinga rû erşê ezmîn
Pirtî per û pirç tê kivşê,
Bardanê ser milê sevan
Hemî têr û xurc tê kivşê.
Heta bînê hilnedî tu,
Heve şêle etrana kûz:
Rem û îsaf lê berbe jî,
Qey bêfêle meriyê mirûz:

Hergê çola ne beledî-
Xar û mêle riya rast û dûz:
Gul-sosina serê rê jî
Mîna qal û qirş tê kivşê.

Çiqa bêjî, şiro vekî-
Ro zara sebîra tope:
Dîwarê kor xalîçeke,
Yeke, wîra cil û lope:

Bîne dayne kursiyê qutnî,
Erbeçîra dîsa kope:
Xas û qumaş li mirtivke –
Mîna kevn û kurc tê kivşê.

Fêrîk bilya, go:- Şayîra
Şayîr heye-dara xurmê:
Hêşîn dike li baxçê xas,
Li bin tevê, nava germê:

Lê, ax,dara xurmêbe jî,
Yan ya sêvê, yan ya hurmê,
Yeke, li ber destê aspêj
Postê qonc û qirc tê kivşê.

## KANIYA ZELAL

- Kaniya helal, kaniya zelal,
Ku dikişî tu wa hersal:
Hêşîn dikî der-çîmana,
Dixemilînî mêrg-bostana,
Lê gelo çiye heqyata te
Pêşberî wî emekê te?

- Ku nekişyama der-çîmana,
Ku nekişyama mêrg-bostana,
Ava min jî wê gol bibya,
Şêlû bibya û binicya.

Ez wa dikşim, dixulxulim,
Lema sal-sal ez cahilim,
Ku cahilim û zelalim,
Eve hema heqyata min.

## MÛR – MÛRÎ

Carekê cara,
Xeber hat zara,
Mûr-mûrîk hebû:
Rojekê rabû
Xwera mal çêkir,
Pel serî ket, mir.

Çivîka xemxur
Xwe kur û kemkir-
Qijik hate cem:
- Çivîka kur-kem,
Go, çima te wa
Xwe kur-kem kirye?
Go:- Tewî-tewî,
Ne mûrî mirye.

Qijikê li vir
Dûçka xwe jêkir,
Firî vê carê
Danî ser darê.
Darê go:- Qijik,
Te çima dûçik
Usa jêkiriye?
Go:- Tewî-tewî
Ne nûrî mirye.

Darê ax kişand,
Belgê xwe weşand...
Û evê carê
Hat xweyê darê.
Go:- Darê, darê,
Çima belgê te
Hatine xarê?
Go:- Tewî-tewî...
Te seh nekirye-
Ne mûrî mirye...

Go:- Dara delal,
Meke xem-xiyal,
Mûrî çû rehmê,
Tu saxbî dewsê.

Dar careke din
Hate xemlandin,
Gote qijikê:
Go: - Herê xûşkê,
Meke tu xemê,
Mûrî çû remê,
Tu xweşbî dewsê...

Dûyê qijikê hat,
Çivîkêra got:
- Çivîka delal,
Meke xem-xiyal,
Mûrî çû remê,
Tu xweşbî dewsê...

Çivîk hêja hat
Ser qam û qanat,
Perwaz dane xwe,
Çû nav refê xwe...

## PIRS JI DARÊ

Bêje, dara rezêd al,
Sêra bext û emir bal...
Bêje, bike misilet
Ji serhatiya xwe bilet.

Wa tu têyî sal-zeman,
Çi qezya te, çi deman...
Bêje, çiqa surr û şext
Tera edû aqa wext,
Çiqa ba û bobelîsk
Te canika canra lîst,
Zerpê çiqa dest-tekû

Pişta teye terrda çû,
Çiqa belg te hatin xar,
Çiqil bûne birîndar,
Derbê çiqa zarr û çûk
Te weşandin sêvêd pûk,
Çend birûskêd ewirêd gurr
Ser te kirin xurre-xurr?
Hema usa tîk-kubar
Wek zerîke ejdîhar,
Dêmê teyî nav rewşê
Me gihîştî vê rojê?...

***

Hafa gêlî, bin zinar
Kanîk zelal jê tê xar:
Dixulxule sal-zeman
Ber bi çayîr û çîman.

Kaw vekirîye dêm û ber:
Zerî, domam têne ser,
Îsan, heywan û rêwir
Dixun ava cewahir.

Lê kanînga terlanî
Naçike tu zemanî:
Çiqa dike xulexul,
Aqa çivre û cahil.

***

Diçim ez, çi rinde, ku mêrga avî
Bê şel û kevire, temize safî,
Lê gava se-kûçik ewtiyan min li wir-
Min ax kir, ku tune çend şel û kevir...

***

Xalê min kêra xwe da ber çerxê,
Merd anî avîte stuyê berxê,

Lê vê bêxweya han, vê bêxêrê
Bêfesal pirpitand xwe ber kêrê:

Û kêra tûjkirî situ kir qet
Nebixêr hat pêçînga xalê min ket...

## KANÊ EW DÎDEM?

Keriyê pêz xwe ji dûmanê dipî,
Dişiqite nav qeselêd sipî.

Nav bostanêd rût, çend golikêd jar,
Pirçêd bijoqî, dadilêsin bêçar...

Lê dayîkeke daw-dêrê pêjal,
Pilêçêd paşin direvîne mal,

Çend çivêrûkêd pêşa wê girtî,
Pêra dibezin bi ken-laqirdî.

Li wir hîvîya wan tendûreke germ,
Kulavekî nerm, çîrokek miqerm,

Çend silq û kartol- nav tendûra gûr-
Kanê ew dîdem dema sehir û sûr?

Heyran-hijmekar ez li hîvîyê mam,
Sal hat bihurî- nehat ew heyam...

***

Cêrga kermê pêz
Ber dîwêrda-rêz...
Esir,edlayî...

Dûyê qelina Cemêl
Hiltê xar û mêl
Ezmanê sayî.

Çend mirîşkê zer
Kicêc dikin ser
Kulîkê himber.
Dîk ketî kêfê
Eşqî axlêvê
Bang dide beter.
Tê bîna pûngê
Ji nav dirûngê
Kirta-kirta pêz.
Kewêd pirbelek
Ji "textê" qudret
Hiltêne hevrêz.

Çi bext û qeder
Te xwera ker-ker,-
Tev vî gundiyê han
Dîncî dilovan
Xwey kira ev pez...

## BIRRÊ EWIRA

Birrê ewira kişyan rêz-rêz
Ger-guhêrê ezmîn.
Hebiya çenge buşkulê pêz-
Xwera-m têkira tizbî...

Û bavîta du hev kit-kit:
"Xêr û şer û xuda"...
Ax, tu bextê şayîrê kurd,
Ax cenimek cuda...

Heyf nîbûn ew xam û xabûs,
Zevî, zinar û zax-
Naha hevana min hebû,
Hevalekî dilsax.

Meyê birrê xwe bajota
Nav pirêza teze,
Tase şîrê miya bidota,
Danya “Kaniya Mîrze”...
Û palda, xwera xweş xeberda
Meyê ber siya partê...

***

Pîrka mine reın
Werda remetî
Digo: “Min xarye
Ava heyatî.
Digo, ez namirim,
Hetanî hetê,
Ezê bimînim
Li rû, hewatê.

Pîrikê rastiyê jî
(Nizam çi wextî)
Xarye, qey bêjî,
Ava heyatî:
Va ber çevê min
Ew sax, silamet,
Destê wê di bin
Mêzera xilmet,
Berdevka çîl ber,
Sedef tijî ser,
Kumişk li sêrî,
Şera reş dorê,
Kund vedaye ber
Kevya tendûrê.

Pêşa dêrê kesk
Pejal vedaye,
Pişîka belek
Ser pal vedaye.

Çevê xwe girtî
Dike –mirre, mirr,
Silq dike çizîn
Nav tendûra gurr.
Û beşereke
Şîrin ser lêvê,
Hikyata "Silqo"
Ji mera divê...
Ji mera dike
Gilyê cinetî
Pîrka mine rem
Werda remetî...

***

Îşev dîsa kalekala berxa bû ber guhê min,
Îşev dîsa wek tifala kêflû bûbû ruhê min.

Îşev dîsa bê şerr û dew ez li çiya û baniyê me,
Û kerê xwe min berda bû dora cew û kaniyê me.

Ezî xewa nîvê şevê, vanê siya xwe min pîva,
Û hetanî serê şivê sî bû sê ling û nîva...

Û çev minda va mexelin berxê me li ser ava,
Kerê şivîn ji birn derket û hate wan hindava.

Bergalêd me li ser fêzê, pez hêwirî li biniyê,
Şivan tase şîrê miya- dot, bir danî nav kanyê...

Û paşê kir kêf, laqirdî, çika kê dil ketye kê,
Wexta berxa bela dikin yara kê pêşyêda tê...

...Û hey qise, hey laqirdî, dîsa gilî û qirar,
Kevçî hatin dorbidorê, sirê hate şîrê sar...

Sî ket nava terazina, bakî hênik nerm gujya,
Şivan "yehkir" li bizina, û berxê me pey kişyan.

Bû pişkînya karêd kever, xirmîn kete dor ava,
Ez dîndarê çolê mabûm hetanê ro çû ava.

Roavayê min berxê xwe bir belakir, şiv danî...
Vê sibê rabûm û qelema xwe şayîrtiyê hilanî...

## MIŞKO

Mişko binê dîwêr veda,
Qulik çê kir,
Xwe tê cî kir,
Xwexwe xwera wa xeverda:
"Pah, pah, pah, pah, bav remetî,
Agir dêla dê neketî,
Te çawa bê pot û palan
Hilgirtiye dîwarê han?"

## ÇÊT

Rex mirîşkê , varê,
Çêtê çîlî qerqaş
Situ radihêle
Yan-yan ser alîkî
Û bang dide hêle:
"Kî-kî-la- kî...kî-kî"...
Çiqa beng û guman,
Çîroktî û çûktî-
Heye nava bangdan
Û bengzê vî çêtî...

## ŞÊR Û RÛVÎ

Şêr ji cara carekê,
Hat û li ber darekê
Dît rûvîkî qewitî,
Vegerya ser wa gotê.

Go: - Rûvîngê minî çûk,
Yeklep mînanî pepûk,

Min zûva nav-dengê te
Û fêl û fersengê te
Bihîstibû, lê were
Min nedihat bawere,
Wekî ev rûvyê fêlbaz
Aqa çûke, belengaz...

Rûvî dela xwe hilda
Û cava şêr li vir da,
Go: - Eshabê bi gewde,
Ew çi pirsê bêsewde?

Axir ez ne çûk bûma,
Yeklepî pepûk bûma,
Ne zirav û jar bûma,
Li van besta, top-gira
Ezê çawa xar bûma
Nava hezar qul-pira...

## RÛVÎ Û DÎK

- Selam elêkim, ay Evdil-Qazî,
- Elêkim selam, rûviyê canbazî.
- Tî çi pêşeyî,- rûvî divê dîk,-
Ser ewê darê reqe-rûte tîk?
Ca jorda were, vê siva sayî
Em nemezekê bikin tevayî...

- Belê, ezê bêm, lê hê zûye, zû:
Merîk a wê tê, du tejî li dû.
Bera ew jî bên û em tevayî
Nemeza xwe vir bikin dil-şayî.

## DÛDÛQÛŞ

Dûdûqûşê lalî kor
Qolîtkêda zor bi zor,
Neh-deh xeber zar kirin

Û ji xwera kar kirin.
Ceh, garis û çend bêşe,-
Hew texmîn kir-dengbêje.

Rabû kubar û babax,
Firî û çû nava bax,
Danî serê darekê,
Emirê xweda carekê
Bihîst dengê bilbila –
Seda evîn û dila:

Û rind bilbil mêze kir,
Deng-miqamê wî seh kir...
Lê tu were, nebihîst qet
Çend xeberêd xwe seqet...
Li vir serê xwe daxist,
Herdu baskê xwe raxist.

Go: - Miqam tên guhastin
Ez ku dibhêm –diwestim:
Bilbil dike qalme-qalm,
Lê pirsêd wî nezelal,
Tu kesek jê fem nake,
Seda wî begem nake,

Dengê wiya pirawaz,
Lê ne xweşe û nenas,
Kilama wî ne sade,
Tu kesîra dest nade...
Hê rind nîne, bilbil jî
Wek min pirsa bîne cî?

## DÊLIK Û KOPEK

Dêlikê got:-Keleş lawiko, zomê me cînarê hevin:
Orta zoma şiverêne, berda gelî û neqevin.

Gava ezê sebira dilê xwera ber bi yalê we têm,
Kotî şindokê kopeka li gewira te çarde çevin.

Kopek gotê: - Keleş gewirê, zomê bigir heya zomê,
Ezê geryam Musul, Heleb, Dîyarbekir, Şeng û Şamê,

Minê huba dilê xwera tu nediye, ne bînaye
Şemçiryaxek beramberî te canikê, te domamê.
Dêlikê go:-Lawiko qurba, ezê heme, ezê heme,
Yeke tîte pale-pûle çevbeleke kefeweme,

Par ber derê xayîngê xwe tuleke nes xişimî bûm,
Îsal pêra, wele dîsa xista stûyê lawikê xweme...

Kopek gotê:-Keçikê qurba, xatirceme, xatirceme,
Ez jî sala par cewrik bûm, îsal savêra ber teme,

Lê tu were gilîya kurt ke, min dûr keve, hey dêl makê:
Go, gihîştîye qama nîvro, li min hatîye wextê lakê...

## HIRÇ Û QABAN

Hirç xwera rokê ji serê darê
Lepek-dudu gûz anîbûn xarê,
Dişkênand, dixar,
Qaban lê kir qar.
Jêra divêje:
- Wey hirçê bira, tu û ew pêşe?
Tu dinê-dinê
Bûyî hewcê wan koriyê nehêje?

Ca li xwe binhêr,
Wan korya binhêr...
Tu axê êlê, tu pispor, tu zor,
Ew gûz xurekê kurebeşkane,
Xercê mişkê kor...
Tera, pismamo, xurme dikeve,
Dikeve kaktûs,
Şivtelê narinc û sêvê şefran,
Lê ne ku ew gûz.
Bira ez bimirim li deşt û dûza,
Xwedê min neke hewcê wan gûza...

Hirç bû, bawer kir, îda gûz necû,
Kakil û kurçom tûkir, lêda çû.
Çû virda-wêda hevekî gerya,
Dîsa vegerya,
Dît...çi bivîne, qaban nolî sa
Dikeripîne qalikê gûza...

## MÊŞ Û KERMÊŞ

Mêşê, kermêşê
Çerx vedidin nav axilê heywanda.
- Cenûke hespa,- mêş divê,- hebûya,
Min dabelanda...

Kermêşê mêş girt,
Wa gotêda kurt:
- Keremke, here piş boxaza min,
Wê derê tijî cenû û hespin...

## BA, BERF Û BARAN

- Wekî ez bêm, tuyê xwe kukî?-
Bê berfêra wa xeverda.
- Ezê siyarbim te dînikî
Û peya bim çel û nerda.

- Lê ez bêm ku,-şiliyê gotê,-
Çar – sitara te çi heye?
Berf hêrs ket wek melkemotê:
- Devşilê, kê haj te heye?

## ÇÊJA "XIŞTÊ" Û " SOVA DÎN"

"Şev jî ne tu tişte,
Ne tu kare û kêf,
Ne kes divê "pişte"...

Ne reve, ne rikêf.
Tenê wehîd rûnê,
Melûl bike mirrîn,
Biger dor sitûnê,
Poçika xwe bizvirîn.

Nadik naçe-nayê,
Peniyê pencirûkî,
Yan tevaxa dayê
Bigirî deverûkî...

Maka malava jî
Wekî kete xewê
Welle, bîrê diçe,
Ku ma Xiştoka wê?"...

Awa hişyar mayî
Xiştê tek û tenê,
Guh berjêr berdayî
Xem dike rebenê.

Yek jî mînanî wê
Xew teqisye ji çev
Ew "heywana"hanê
Situdirêj ecêv.

Lê hema ew hêrs bye,
Sor bye mîna cûrrcûrr
Û "tû" dike pêşber,
Xweda dike pûr-pûr...

Hilbet zef bînteng bye,
Tenê, wehîd, bêxew...
Gelo nave, wekî
Xiştê bilîze tev?

Û nerm dayêda dest,
Lê agira aşît
Usa tetê wê gest,
Hêsira çevra avît...

Xiştê girya, feqet,

Qursax unda nekir,
Hilda şalek xilmet
Û dûrva lê warkir...

Hilda gulok gore
Avîte "qureyê",
"De, go, bimire here,
Kera bêcûreyê"...

Lê bêcûre hêrs ket,
"Zimanê" xwe derxist,
Rahişt xas û xilmet,
Gihîşt bevşik û bist.

Bû kuxte-kuxt, kufîn,
Malêda bû hewar,
Rabû Xema xilfîn,
Rabû Nadê xewar.

Yê şal revand, yê şerf,
Yê da sîn û misîn
Av reşandin û berf
Ser zimanê ya "dîn"...

Zimanê wê kişyan,
Tepilxanê danî,
Derî-bacî dadan,
Û edilî xanî.

Lê Xişta me? Xiştê
Ketye qulçê xênî,
Şivek dane piştê,
Tepek dane sêrî.

Mirûzkirî maye,
Maka wê jî hat bal:
- Kê, go, li te daye?
Girya Xişta tifal,

Go: - Lê? Dîna hanê
Wa li hev xist ev tam...

Nadê kor jî anî
Dewsa wê ez kutam ...

## GEWIRÊ, QORÊ

Ez ji bera bilaşûka,
Mala mîr Badînim,
Xalê weme, gelî çûka,
Xwe qolayî nînim?

Çûme yerê "Zirtikzemîn",
Êla virrişîka,
Zaninı erebî, ecemî
Û zimanê pişîka.

Rind pêk tînim "Beyta nêrgiz",
Qewila "Miremirê",
Zanim kîjan nêrgize diz,
Kî aşiqê surrê.

Kî nêçîrê xwe mal dike,
Kî li gaz-gêdûka,
Carna divim serdewatiyê
Givir, gerneûka.

Hemû şerr û şikyatê wan
Bêy min tune, tobe,
Azirû dikim, çi dew-duan
Orta wanda dibe.

Li vî şerî ez tev nebûm,
Min hesav kir zêde,
Ne kuştin bû, ne hiştin bû,
Huceteke sade...
De seh bikin û ger qelpî
Heye li vê dîrokê,
Xêrê nevînim ez belkî
Ji mirazê pîrkê...

Hergê xêr bû, hergê şerr bû,

(Xêr û şerr bi xwedê)
Pişîkeke qore serrût
Bezya ber bi lodê...

Gewra me jî derê malê,
Meşqûlya wê pê girt,
Çing kir da pey wê kêvjalê
Pêşî birrî, lê girt.

- Hirr-hew, go, hoop...xwedê xêrke,
Cirîda te boy çiye?
Nevî dayka teyê mêrke?
Yan bavê te zewiciye?

- Ne ew, ne ew,- Qorê gotê,-
Nêçîra min – mişko,
Awa bezî ber bi lodê,
Min jî li dû gişt kir.

-Ê, lê? Evê rojnedîrê
Tu çoqilma çokmîş,
Dernekevî rew-nêçîrê,
Lê tê çawa kokbî?

Lê, teşkxara bêvilkînor,
Qet navînî ber xwe
Hewiş-hidûd, seyman-sînor?
Ca paşîportê derxe.

Ka binhêrim kê nivîsye
Ku tûra bengzada
Bê û çirtik vir bilîze –
Hewşa esilzada?

- Canim, çi çirtik û çirtbaz,
Wêda, pêşyam hilde,
Nêçîra min...ew bêmiraz
A wê çû ket telde...

Lê gewirê vir lep hilbirî,
Serda xurya ecel:

- Turuş nekî pêşda herî,
Haan, kera keçel...

- Lo han, kera toxavk diz,
Ser kê gef û gurrî?
Here bibez xatya Xezê,
Ku dêla te birî...

- Dêlam xêra pîrika teye,
Bê xêr-xêrat derê
Lê min qafê te kirmitand,
Yanê xatya Perê?

Heska şujîyê...heska şujîyê...
Heska şujîyê şermke...
Here serê xwe şimitî
Ser terzîkî çermke...

Û zef hevra dane çêra,
Kirin qajîn, mewîn,
Ewê wêra, ewe wêra,
Qar rêz kirin, hemîn...

Hey-neyê hev dan xevera,
Dageryan dê-bava,
Hetanî sî six bû gerra,
Heta ro çû ava.

- A, ro diçe, qeda naçe,
Qorê mest kir mewîn,-
Ay, canim, go, tu qedayî,
Yanê qedagerîn?

Bihêl herim malkinga xwe,
Naha kûçik berdan,-
Gewirê kir ku bide çêra,
Lê hizingek der da.

Lepê wê vir berda hatin
Qey bê xwe mukurî:
- Çima kûçikê we berdidin?-

Melûl kire mirrîn.

- Lê çawa, go, ew seypisan
Min bye bela peşkê,
Berkevim, hema sax-sax
Min ji hevdu tîşke.

Diçim, dertê dide çêra,
Xwe zincîrê dixe,
Parî nan ku dixum, pêra
Ew çevê min dixwe.

- Yê me jî ne xwedêrane,-
Gewirê jî dil nelya,-
Çawa bûne emelê me
Ew gawirê gelya...

Meriv carekê hev bive cot,
Heqê wanra bê der...
Yê we zefî dirre,- wê got,-
Em herd nikarin ser?

-Çirr nikarin, xep, xep herin,
Tu rahêle dêlê,
Ezê pencekî miqerim
Bavêjim simêlê...

- Ûf, xûnê ça bike çirîn...
Wê ça bike kastîn...
De bira îja here gurrî...
"Bixwe" lak û hestî...

- Mêş û morê bêne dorê...
- Û wê bide moza...
- Wê biheybe, here çolê,
Gelî û geboza...

Û vir bû pîrqînya herda,
Kenyan Qorê, Gewirê,
Paşê kenê wana berda
Û rûniştin şêwirê.

Qirar kirin wî teherî
Kûçika bidin cezê,
Lê çimk îda şev bû, terî,
Kar kirin ku razên.

Çûn ketin ber teldê sûrê
Û lezetî paldan.
- Êêf,- Qorê gote Gewirê,-
Çi xweşe van telda!

- Xweşe, xwedê ava bike,-
Gewirê gote Qorê,-
Lê serê xwe awa bike,
Xwe nedî ber surrê.

Û hemêz kir heyf û amin,
Çawa ku dê – qîzê,
Û ketin nav xewa şîrin
Bin hîva payîzê.

## DEWLEMEND

Agir girtibû kincê merîkî,
Ji alava gurr ew dişewitî:
Mînanî dîna zû-zû dibezî,
Ha dikir hewar, ha dikir gazî:

- Birano, komek, ez dişewitim,
Ax, bextê weme, ca min xilazkin!
Lê kesî gazya wî seh nedikir,
Wê zulma giran xilaz nedikir.

Û feqîrî nav wê qal û belê
Dixwest bivîne çar û mecalê:
Ancax çevê wî çemê pêşber ket,
Hat û cefakî berbi çem rê ket.

Xwest alavêva xwe nav avêxe,
Belkî ruhê xwe şîrin azake,
Lê dewlemend wa pey wî kir gazî:

- Ca sebir bike, çima wa lezî?
Bise, cixara xwe li te vêxim,
Agirekî wa ezê ku destxim?...

## MILKEDARÊ ÇEVQUL
(qisa gel)

Rokê yekî milkedar
Çû cem padişê xwey extiyar.

- Padişa saxbe, go, zanî,
Vî erdî, vî ezmanî,
Xwelya mine çandinê-
Îda nayê gotinê,
Awqa kême û bêkêr,
Ne kar jê tê, ne jî xêr.

Têm padişê xwe bi lava-
Vê hilde ser hesava,
Vî gilyê min bê rehmê,
Minra bike keremê...

Padişa rabû nivîsî
Qewl û qirar ser qazî:
" Bidine xweliyê aqasî,
Ku bimîne pê razî".

Û qazîyê me destê merd
Rabû pîva gele erd,
Pîva çendik-çend hêktar
Û birrî da milkedar.

Milkedar go: - Malava,
Ev bû qeydê hesava,
Ne padişê go gelekî,
Çi bikim vî hevekî?

Qazî rabû hê pîva
Wek çend hêktar û nîva,
Birrî serda zêdekir,

Lê dîsa ma bêşêkir.

Û dest milkedarê ac
Ku îda ma bê îlac,
Go: - Hergê ne qayîlî,
Em pevkevin vî qewilî:

Kewşen eve, deşt eve,
Çiqa karî bireve –
Çiqa ku tu bibezî,
Xwera hilde awqasî.

Milkedar go: - Razîme,
Qayîl ser wî sozîme,
Got û xwe dît tivdarek,
Go: "Ya xwedê, ya felek,
Ya ateka ziyaretê"...
Û rabû ket hucetê.

Mîna hespekî bi zîn
Wê bestê ket kel û bîn
Û dane xwe çend aqar,
Lê çevî tim lê nebar,
Revî-revî bi acî,
Bîn lê çikya, biecî.

## KALÊ Û EZRAHÎL
(lêgênd)

Kalekî extyar,
Belengaz, bêçar,
Pişto dar piştê
Balte-tenişţê,
Ji nava mêşe
Tê û dibêje:

"Mala minda ar tune,
Dirlik tune, dar tune,
Tendûr sare, kod rijî,

Ne dewe, ne doşanî,
Of, vî piştiyê hana jî
Lap ruhê min deranî"...

Bar avît bi kezelik
Gazî kir, go: "Ya xaliq,
Tu ruhê min bistînî,
Ji vî halî derînî"...

Got û negot ev xeber,
Yek sekinî li himber
- Va, hatime,-jêra got
Ezrahîlê melkemot...

Kalê tirsiya, saw ser ket,
Lê xwe unda nekir qet.
- Hatî?...belkî, go, xwedê
Wa hewara te jî bê...

Min zehmet da te, feqet,
Tune tişkî zor-zemet,
Xênji van qirş û qonca:
Min heyrana xweke ca,
Hilde bide pişta min,
Veger here carek din...

## KOROXLÎ
Lêgênd

Koroxlî ne qereman bû,
Ewil Koroxlî gavan bû.
Garana xwe siba dibir
Li xaın, xabûsa têr dikir,
Êvar-êvar dajote gund,
Serê malê yek nanê rind
Berev dikir çawa heqyat.

Lê çend gedê bîc, bêbiat
Diçûn pêşiyê herro, herşev,

Lê dixurîn bi gurr û gef,
Şivek didan delingê wî,
Jê distandin nankingê wî...

Difikirî meriyê dûrşerr –
Nan nede wan bîcên beter,
Xirabyê jê çêbe, hilbet...
Tişkî pak jî nîbû, feqet,
Wekî birçî dima rêncber,
Birçî diman mal û nefer...

Rojekê jî gavan li wir,
Gava nanê xwe top dikir,
Dît, wê birre seh li cîkî
Dikûm dikin ser bocîkî...

Lê ew bociyê hanî beter-
Qote hestuyê kotî li ber,
Ha xwe davê evî kelbî,
Ha xwe davê ewî kelbî,
Digirije, bûye agir,
Hestu nade wan kelbê gir...

Koroxlî ev yeka ku dî:
"Wey, go, kulê minda hatî...
Eva bociyê hanî çûçik
Şerr dike ber aqa kûçik?

Ez nikarim –ez gahûde,
Berdime çend gede, gûde?"...
Û berev kir wî nanê xwe,
Kire tûr û hebanê xwe,
Hat dît, vane bîcêd beter
Dorê dîsa bûne çeper...

- De kanê, go, serekbaşî,
Koroyê me îşek-kîşî,
Çika îro te bona me
Çi loş, bokon top kirine...

Got... Lê feqet vî gavanî
Çomaxê xwe bir û anî
Û...him û ha- bin pelagoş:
- An ji tera bokon û loş...
Serekbaşî erdê bû zend,
Lê koma wî wir deste-dest
Revî û çû... Hew bû îda,
Nehatin ser Koroxlîda...
Lê Koroxlî wê rojêda
Îda terka gavantiyê da.
Ewî hilda haletê xwe,
Zîn, bûsat kir "Toratê" xwe,
Gerya îda çawa egît.
Li ku meriyêd neheq didît,
Eslankîmî dajote ser,
Heqê wanra dihate der.

## ZERÊRA

Qîza min ezîz, tu di başteda
Baş bûyî, bedew heyf û hêje.
Di nava qefsa sîngê teda
Dilekî bi rem hildavêje...

Xerîbdostî tu, pêş û pêcirî
Te ji meriva bawer kirîye,
Parîyê bi cefê zor qazanckirî
Birçîyê bêçarra te ker kirîye...

Li ser fesadîya nebûye guhê te,
Ne fêlbaz bûyî, ne hoqilbaz.
Lê anegorî rastîya ruhê te
Xwedê neda te bextekî baş...

Divên dizgîna bextê îsanet
Destê wîdane bi xem û dem.
Tu zef xîretî, terbet û zane –
Layîqî şanê benîadem...

*07. 03. 1997, Nîjnî Tagîl (Ev helbesta Ferîke dawiyêye.* F. H*)*

***

Ew “mamostê meye”, wekî
Me hîn dike zimanê dê,
Îro dewsa dersxanekê
Serak mezin va guh didê?

Kuçikê kartola dadide
Tev tifalê gunde tûre,
Lê ji bona poêziya me
Ew xwe-xwe bûye agir-kûre.

Ewî daye methê ewira,
Çiyayê Dibûr, Hevtêmanat,
Ser mezîla qurn û dewira
“Usivê Nevîya” kiriye Ferat.

Wî sax kirîye, qey bê ber me,
Kalik-pîrikê me pehmetî,
Texsîr kirîye şerr û qirme,
Zêrandin û zinêqetî.

Pesiniye wek folkilorê
Rewşa rinda, dêrasora…
Meth û sena ji avtorê
Beyta “Rihana Resora”…

*(Payîza sala 1984-a li sera nivîskarên Ermenîstanê bi şeyinatî 50 saliya ji dayîkbûna Fêrîkê Ûsiv hatibû kivş kirinê).*

***

Ez ku mirim –
Min bi axretek axreta nûrîn,
Definkin hûn ser çiyayê Dibûrî...
Ku batan kerî, batana sûrî
Dora tirba min çiyayê Dibûrî –
Hingê ruhê min-berxvanê berê,
Hêlbiya hisreta xubara qebrê,
Tevî kerê pêz ji çiyayê bilind,
Êvara bata belabya nav gund…

# KURTEÇÎROK

## KURIK, ÇIQILÊ DARÊ JÊ NEKE!

Ewilê biharê bû.

Kurikê delal hewas dikir bavê xwe ra here seyrangê –li mêşê dora bajêr.

De, mêşe biharê zef xweşe: bîn-boxsa şînaya terre temiz mêriv berbi xwe didefîne. Çivîk têda dixurdilin, dikine wîte-wît, teyredêd perdirêj baska vedikin û bi kêfa xwe ser mêşera çerx vedidin, qey bêjî dixwezin mêşe tevî hemêzkin... Lê hemîn minminîk, syarê bûkê çiqasî bêjî tijene, bi seda, bi hezara...Tenê zorî, bigere...

Kurik, mina pişîkê nêçîrvan, tele-tel dida pey wan. Lê bêxweya qet tên girtin? Usa banz didin, difirin, çivîk bî jî pêra nagihînî...

Û kurikê kamço bûyî aciz dibû. Hilparkî darê terr dibû, mîna qirnika pêva hildikişya, belg û çiqilê wan jê dikirin.

- Ohoo, ew nebû, qet nebû, çiqilê dara jê neke, îzin tune, dare terrin,- bav li kurik hildihat. – Axir, wekî çiqilê dara dêrs bin, dar birîndar bin –îdî şîn nabin, îdî ev mêşeyê tunebe...

- Îja çi?- kurik ber bavêda tê,- emê jî herine mêşekî dinê...

- Nebû, nebû,- bavê gotê,-axir kurê min, çira belgê dara jê dikî, çiqilê wan dişkênî? Ne ew jî mîna te terr û canin, ew jî mîna te şîn dibin, mezin dibin. Gelo wê rind be, ku yek bigire pozê te berda kirtke, guhê te jêke, porê te verû?...

Kurik pormijî, melûl û poşman li çiqilê destê xwe nihêrî û got:

- Edo, lê nabe, wekî em çiqilê darê dîsa pêva kin?

- Nabe, birê min, ew nabe, lê virhada îdî jê meke...

Roj derbaz bûne. Kurik dîsa bavê xwera diçe mêşe. Kulîlkara, çivîk û minminîkara dîsa şa dibe, lê îda deymîşî dara nabe. Her carcarna, destê wî cêvê da, tê ber dareke şîn disekine, mîna mezina bala xwe didê û bavêra dibê:

- Edo, guhê wê îda dirêj bûne, pozê wê jî daliqyaye...

1967

## BERANÊ "MÊRXAS"

Birre pez binya mala diçêrya. Maşke xwera wêderê ketibû. Pêz gişkî zani bû, wekî ew Maşke kelbê wane, beranê Kol jî zanibû. Lê ewî nişkêva serê xwe hilbirî, guh pînc kirin, zûr bû Maşkê nihêrî (çawa ku teze bivîne) û ber xweda guva ku "hêdî got":

- Hi, evê han gur nîne?

Lingê xwe erdê xist, go:

-Hêy, tu kîyî?

Maşkê dêla xwe hejand,

- Hela lê,- Kolo go,- kopoxlî dengê xwe jî nake... Herim teselî kim, yan na gurbe, xwe nişkêva bavê pêz?

Û ewî dûvê xwe hejand, qutam-qutam ber bi Maşkê çû, pozê xwe dirêjî pozê Maşkê kir, bîn kir û, giva teze "hisya bûyî" guh daliqandin, vegerya.

Mîya qere-qavik, ku her tişt texmîn kiribû, hatina Kolora kire carîn:

- Pî la çevê min kor bûyê,- ewê Kolora got,- te çawa qursax kir, hema usa rast-rast ajote ser?... Dil cegerê te pola bûn?... Min go gure, we xwe bavêje te...

- Na, gur nîbû, xwera arxayîn biçêrin... Nanê bavê wî mezin bû gur nîbû, yanê na,,- Kolo xebera xwe nîvcî hişt, bin çevara mîya nihêrî, qefes pingirand û bû xirme-xirına wî çêrya...

1967

## KILAM

- Tu çi kilamî hiz dikî?
- Ez ya "Mem û Zîn"...
- Ez ya "Gidî lo-lo"...
- Ez ya Şivan Perwar: "Xanima min"...

Pirsekêra hezar û yek cabê dibîhîzî...Kî raste? Her yek hindava xweda raste. Lê kîjan kilaın xweşe? Ew kilaın, ya ku dilê mêrivda hisreta hişyar dike, ya ku ruhê mêriv nazik dike, qelbê qenciyê davê dilê mêriv?...

Kilam zûda pêşda hatiye. Berî pêşdahatina îsanet - heywanet sitraye û distirê. Wextê pişîk ber tendûrê ditele, çevê xwe digire û bi awakî dike mirre-mirr "hirr-firr - hirr-firr"...ew kilame, kilama edilayê û xewê. Wextê kelb berê xwe hevraz dike û "divê" "hew-

hew-heûûû"... ew kilame, kilama derd û dewê. Wextê mirîşk bedena xwe gupe vedike, mîna xanim-xatûna dimeşe û "divê" "Qiix...qix-qix-qix-qix", wextê çivîk çerx vedide û dike çîve-çîv, wextê reşêle ser têla datîne û dike çike-çik: "çik-çik çivvv...,çik-çik- çivvv..." – ew eseyî kilamin, kilamê hişyariyê û şayê...

Lê berî heywan tebiyetê sitraye. Wextê ba dike "hûûû", wextê belgê darê dikine xişîn, wextê av dike xule-xul, wextê xarina berkelê dike qilpe-qilp – ew kilame...

Lê kilama îsanet diha kûr û pirr awaze, diha bi ruh û xeyset va perwede...

Hene cûre-cûre kilam û sazbendî. Û îsanet sitraye, kilam bihîstiye di qewlê emir başqe-başqeda: wextê şînê, wextê şayê, wextê xebatê... wextê melûliyê û wehîdiyê...

Wextê şayî meryada tije dive, tê hilnayê – meriv distirê, bi kilamê kela şayê vedipesirîne... Wextê derd dilê meryada dibe "gilê" meriv bi kilamê wê "gilê" vedike, çawa dewrêşêd sazbend bi def û şivêvya kulokanya mera vedikin...

Kilam her tiştîra pîrika zeynandinêye...

Kilam hevala amine, dayka helal...

Kilam namirin...

1967

## ÇÊLEK

Çêlekeke meye boz hebû, nave wê–Çîlê. Çêlekeke baş bû: şîro, avaş...

Lê telebextira bêderêda ceh xar, ceh lêket...

Apê min, bavê min, du-sê lawikava bi darbestê gîhandine tewilê. Tep-rep ket. Intîn- nelîna wê bû. Em çûk, mezin medekirî li dorê civya bûn, lûve-lûva diya min bû:

- Çîlê, Çîlê! Çi ji tera hat? Pî, la çevê min korbûyê...

Heywanê cirisî bû hev, çevê wê korda çûbûn, pirç bijoqî bûbû, çirke-çirka diranê wê bûn...

-Rabûna wê tune,- apê min bi dengekî tesîldar û berxweketî got.

Bêgumaniyê qudûmê me şikênand...

Lezekî şûnda çêlekê hizî da xwe, xwest rabe. Şabûnê em hilkutan.

- Ha, diya min, ha, xûşka min...yalla...yala, de rabe...de rabe...

Dê û bavê min, apê min bi hevra helan dane çêlekê. Pîlêd wê lerizîn, ji cî rabû, çû ber bi golika xwe, serda kire mizîn, sitûyê xwe ser piştêra dirêj kir, çevê wê alast, car dinê çû ciyê xweda gewşek ket, mexel hat.

- Şikir tişt tune,- apê min îcar bi cûrekî şa got.

Em gişk ji tewilê kêzvêz bûn.

Lezekî şûnda em çûn, ku teselîya Çîlê bikin: hetanî em çûn, çêlek bi kêrê ra negihîşt. Apê min, bavê min metel mabûn:

- Canim, çawa? Çi zû? Ne hêja rabû, çû ser golika xwe?...

Lê diya min, hêsir çevada, singê xwe dixist û digot:

- Te dît, ceger bû... Zanibû wê bemire, çû emekê xwe li golikê helal kir...

1968

## PEZÊ TÊRXARÎ NEREVÎN...

Teriyê erd hilçinî. Te ku li wê gavê ji gundê Pampê, çiyayê Dibûr binherya, cetin te kerê pêz û kevir hev başqe kira, hergê nedîta, ku çawa şivan û dûajoyê wî mîna qeretiya hêdî-hêdî ber bi yalê şimalê, tivşa çîyayê Qemerdaxda pêberjêr dilivin. Pez diha xwe da sirtê çiyê. Şivan hanga pêşî ket û çend cara kire "he-he..." Pezê ku lezekî pêşda hey çêre-çêre berjêr dibû, û hey zîq dibû, dikaya, îcar mina eskerekî hazirî, guh li ser qomandar ha-hanga top bû, çipixî hev û li pey şivan dikişya...

Te ku terîda dîna xwe bida, teyê bigota ziyakî mezine jorda dikişe, û şivan jî serê wî "zyayî ye"- hilbiriye, ku binhêre li pêşiyê tu ziyan tune?

Dûajoyê çûkî 7-8 salî, wekî serê wî du buhusta ser pişta pêz diket, xwe da dû pêz û paşî şivkot kir ser pêşiyêda daxist. Bû kuxte-kuxta pêz: şivên texmîn kir, ku dûajoyê xam pez revandiye, zivirî lê kir gazî:

- Ro-rîyo, pezê têrxarî narevînin... Majo, wê xwexwe bê, were xwe bide pêşiyê.

Gede berjêr şiqitî, rex şivên ket û mîna tişkî bi xem got:

- Apê Hesen, ne wekî wî alîda...

Şivan texmîn kir kurik derheq çida dibêje, û xwexwe jî ew nav hilneda, lê got:

-Tîşkî nake, xwedênekirî bimbarek nav keve, wê berjêr bîne...nikare hevraz bive... yekê jî, ev herdu şêr bendî çine?

Lê bona diha arxayîn be, vegerya ser kelbekî kêleka xwe, lê hilat:

- Qesav, telan, telan...

Sê dêla xwe kir nav lingê xwe û tuyê bêjî ji xweyê xwe xeyidî hevekî kir gire-gir û hevraz çû, xwe da dû pêz...

Kerê pêz gihîşte ser cewa navbera çiyayê Dibûr û Qemerdax. Şivan çiqas jî kire fîte-fît û "qurrût, qurrût", xencî çend bizina pez tu poz avê nekir.

- Pez gava dinê tîbûna nediçêriya, lê hema hewa êvarê serket, tîbûna wan şikest,- şivan got û îjar dûajoyê xwera xwe da li pey pêz û berbi guhêra binya çîyayê Qemerdaxe nêzîk ajot...

Pez çawa gihîşte guhêrê - cîbicî ser hevda kerixî, te digo lingê wan jêkirine.

- Meko can,- şvan zivirî ser dûajo,- rabe, mala we nêzîke, rabe here malê, hêsabe.

1970

## DAYIKA KOR

Avtiya "Vîlîs", mîna kêwrîşkê çivane-çivane pertav dike. Ew meriya hildipekîne, lê bengizê pîra têda –mêriv diedilîne, dînc dike. Ew tîne bîra te xanîkî gundayî seqirî, li ku tîrinca tavê kulekêra berwar avîtiye, navda toza "qapûtê pêxember" sovayî dike. Hevekî wêda, li dor beroşa şîre nixamtî, vizîna mêşane. Li ber tendûrê pîrikeke heyf rûniştîye. Teşya pîrê dike vinge-ving, doxa wê digihîje bin tendûrê, "dive" vzzz... Pîrê hingê teşiyê hildikişîne, bakî teze ber dixe, û hilxistin-daxistina teşiyêra, meriv berawil dike, ku çawa tew dikewine qerçûmekê sufetê pîrê.

Sufetê pîrêyî qerçûmekî kûtê nanî tendûrê tine bîr. Zoxalê eniya wê mîna riştane. Lê çevê wêye meliqî mina gîlê tiryaye çilmisîne, ew gîlê kertê sele-sepetada dimînin.

Kes nizane pîrê kê dinhêre. Pîrê jî wê yekê zane, lema jî navê meriya hiltîne, paşê pêra xeber dide.

- Remîle, lawo,- ew heval rêa xwera dibê,- em negihîştin gund?

- Na, inê, na!

- Şikir rem û kerema tera,- pîrê dibê,- hunurê te zêde, ya rebê elamê, meriv jî çevvekirî dinya ronik nevîne?

- Navîne? – em ji Remîlê dipirsin.

- Na. Ewê rastê pirtî birûsî ber heye, lê yê din lap binûte biryaye... Kerbî kurra, feqîrê!...

Pîrê dibhê. Çevê wê xunav dibin.

Ew dezmaleke xilmet ber pişta xwe dikşîne, çavê xwe dixe, dîsa dike ber pişta xwe, hizing têda.

- Min cote şêr mezin kirin, gîhande ber miraza, şerê Gêrman hat ji xwera bir. Ez digiryam. Ez hero, berî dîk-mirîşka radibûm, digiryam, min digo: “Xudê, xudê, xudê, tu Elî vegerînî, tu Esilan vegerînî... eûûû... kûçika teme Xwedê... Hergê qebûl dikî–qebûlke, yan na, herdu çevê min korke, yekî seba Elî, yekî seba Esilan...tenê, min gunekarê bi wî qewilî –ez berxikêd xwe bibînim, paşê... Xaliqê min wa xwera çevê min kor kirin, min kurê xwe jî nedîtin...

Pîrê deqekê kerr bû, paşê dûmayî kir:

- Lê ez dibêm ji Elî, Eslan yekî hê saxe. A, eva çevê min,- ewê dest bir çevê rastê,- hê pirtî birûsî ber dilîze... Ez divêm yekî hê li rûhewataye...Dilê min dibê –wê bê. Qeretûyê wî berewil kim, paşê bimirim...

Pîrê kerr bû, rêwî derbazî xeberdaneke din bûn. Lê lezekî şûnda dîsa dengê pîrê hat:

- Elîyê min tarêqa nozda beranberdanêda bû, lê Eslanê min saltira dine deraxlêvê bû...

1970

## QAFREŞ

Wê salê kelbekî me hebû, nave wî Êtir. Yekî şînî dirêj bû. Apê min bi berxek û şînêlekî *(potê eskera)* kevin dabû ji koça mirtiba kirî bû. Diya min, amojina min ewil gelekî lome li “bazara” apê min kirin, lê paşê, ku dîtin Êtir çito kelbe, gotin:

- Hesen, welle, te gak jî dabûya, poşmanî tunebû.

Êtirî dirr bû, bêrya malê ne dida kesî, tu kelbê gund pê nikarbû. Me, bira, ji zincîra Êtirê xwe digirt dibir li meydana gund. Kelbê here gurêx danîn, me berî hev didan û bi hewas, hêbet lê dinhêrî, wekî

çawa Êtirê fitila dide xwe, dijminê xwe davêje bin xwe û vedigijgijîne. Evê yekê, qey bêjî, kelbê gund li Etir kiribûn dijmin.

Rojekê jî Êtir cûbû mehila din li ser dêlikê, kopek lê berate bûbûn, xeniqandibûn. Hineka rahiştibiyê qels kiribûn, lê Qafreşê mala Memed ew bi eseyî xeniqandibû.

Her cara, ku em sibê radibûn, me holka Êtire vala didît, zincîra wî li erdê: agir dilê me diket. Her hêvya me ew bû , wekî em çi teherî hesavê Qafreşra bêne der...

Heta em difikirîn, wekî derziya, yan dermanê mişka bikin li nava nên, bivin dizîva bavjiên ber, Qafreş rokjekê xwexwe hewişa meva derket. Qey bê pey wê yekêra, wekî serê Êtir "avda kirbû", hatibû xwera aliyê me "seyramîş" bibe, çika qe çi heye, çi tune?...

- Pî, Memo, ne "yaroyî" vaye,- min birê xwera got.

- Hişş, kerbe,- Memo got,- zû here hine nan bîne.

Min banzda malê, kerî nan anî. Qafreş nankêş kir, bir kire li merekê, derî serda dada, û her yekî me da vîlkê... Sayîl ew yek dît, bû zûkînya wî, xwe avîte aliyê dêrî,li qurquranêva qemitand, bi bengzekî usa gune li me dinhêrî, gunê kafira pê dihat... Lê Memo "pêra" xeber dida:

- Hela bêje, te Êtir çawa xeniqand?...Êtir, Êtir, ew şêr, terlan... Te qîlê xwe li kîdera wîra kir,- got û vîlkek da nav çeva, dev-dirana.

Bû karînya wî, revî qulçê merekê jorîn, banzda ser gurzêd gîhê. Me lêxist, jorda anî. Ewî virda banzda, wêda banzda, dît çare lê hate birînê, îda nerevî. Min vîlka xwe xweşe vekir, jorda anî, lê hê lê nexistibû, bû repînya wî ket.

- Te qêfda dayê?- Memo got.

- Na, heyran, min anî piştê, qe pakî lê jî negirt...

- Çawa, lê negirt, lê çima sekitî?...

Ez şaş mam, çi zû mir... Min qafê wî hilbirî – berda, terp li erdê ket... Linga hildibirim – dîsa usa...Qîma min nehat, min hilda vîlke têra kir, xirpe-xirpa çermê wîye, lê qet, îro nemirya, eva hevt roje mirye...

- Canim, mukurya neke,- Memo min hilat,- mirye, îda mirin kelebeşe?...

Me dît nalipite, me hinekî jî xwe egile kir, paşê bi dêla wî girt erdêra kaş kir, bir ber çemê binatara gund avît, zivirîn hatin...

Em çend gava jê dûr ketin, ez carekê wa piş xweva zivirîm, min dî cendek tune...Yah... Dîna xwe didimê - Qafreş kendêlva

direve...çawa direve, poça xwe li xweva guvaştiye û mîna bayê birûskê dipeke...

- Memo, Memo,- min go,- binhêr...

Memo metel ma:

- Kuro, go, Qafreşe...

Qafreş... Qafreş usa em xapandin, xwe terkemirarî avît, guva ku miriye, û serê xwe ji mirine xilaz kir, çû...

1971

## "SALA LEGLEGÊ"

Leglegê me hersal dihatin. Lê sala ku mak ma tenê, ew sal axiriyêda bû "sala leglegê". Hatina wan mera eyd bû. Û, mesele, eyda Xidirnevîda, kuloçê serê salêda, yan zadê pêzda em awqasî şa nedibûn, çiqasî hatina wanra.

Apê min çapûk ( hêlîna wan hersala) dara têlêva mehkem dikir, mile nermegîhê xurt binda radixist, lê amojina Hac wê rojê tivdarekê serbidewê didît...

Rojeke ezîz bû, roja nozdê adarê. Lê wê sale - bîstî hatin. Em, zarêd taxê dor darê civya bûn û me bi qerebalixeke şaterc û berc dikir, ka ji Dûbe (leglegê nêr), ji Lekê (ya mak) kîjan jar bûye, kîjan kok bûye, ka çima dûçkê Lekê kurtisiye, nukulê wê dirêj bûye, ka çima serê Dûbe gewirik têda hatine?...

Wî hesabî, heta êvarê... Êvarê me emekê "mêvana" dayê: her yekî hindava xweda tiştek avîte çapûkê, yê ku nan, yê ku penêr, yê ku den, yê ku keşk, yê ku kartol, yê ku qeysî... Çapûk tijî bû. Paşê em kês-vês bûn. Lê leglegê me sibetirêda derbazî "karê" xwe bûn: xwera hezeka binya gundda rewir digirtin û pûş û pelaş danîn hêlîna xwe tundurist dikirin, tivdarekê cûcik derxistinê didîtin.

Rojeke gulanê Dûbe ji çolê tenê hat û ser hêlînê hêbet qûrtiya. Mezina kivş kir, ku qeziya li makê qewimiye.
Em taxêva ber bi hezekê revîn. Gelekî li Lekê geryan, axiriyê me li ber tûmekî, ew bask birîndar dît, hilda anî malê. Apê Hesen lê nihêrî û berxweketî got:

- Teyrê baz lêxistiyê!

Paşê axû kişande baskê wê û usa Lekê ma bal me – malda.

Dûbe çendekê li hêlînêda xwe da ser lingekî, melûl-melûl nihêrî, axiriyê aciz bû, berbi beriyê darêkir, çû.

Em tefekûrya Lekêda bûn, ka kengê wê qencbe. Mehekê şûnda birîn lap axivî, lê heywana wehîd dîsa mirûz kirî bû. Qulçê malêda xwe dida li ser lingekî, çev niqo dikirin û te tirê dikeve mitala. Wextê usa diya min xweşiyê xwe pê dikir, digot:

- Lakê, Lakê, zefî duşurmîş nebe...Silametî Dûbeyê biharê bê, hûnê bask bidin baskê hevdu, bifirin, xwera li merem-mirazê xwe şa bin.

Meriv digo heywanê gilyê diya min fem dike: reşikê çevê wê direqisîn, dibû lekînya wê, baskê xwe werba dikir, tevizîk radihişt. Me texmîn dikir, ku êpêce kêfxweş dibe.

Bahar hat. Rokê me dîna xwe dayê, Leka me ji qulîtika xwe derketiye, nav malê kêf-kêf diçe- tê, bask bimbûlê xwe rast dike, sîngê xwe dişo, xwe çêdike...

- Xudê xêrke,- bavê min diya minra go,- Lekê çima îro wa çev li xweye?

Cawa bavê min bû qûrtînya Lekê, ecele cariya û banzda li derê malê. Em pey çûn.

- Bûn sisya, bûn sisya!- eva hêwirza zara bû.

Lê herça kulfet (jin) bûn, gotin:

- Pî, lê xwe heyîrî, Dûbe hêwî anîye ser Lekê...

Dûbe ji beryê dagerya bû, xwe dabû li ser hêlîna sala. Leglegeke cîwane bêcan ber singê wî qincilî bû hev. Lekê dora hêlînê çerx vedida, rikêfî mêvana teze dikir, lêlê bû pûrtevekira. Lê Dûbe perr hildavêtin, nukula lê dixist, ne dihişt li ser hevala wî ya tezeda bê.

Mefera Lekê hate birîn. Dît bêfeydeye, bezî aliyê malê. Me tirê xeyidî diçe qolîtka xwe. Lê na... Nav malê bû leke-leka wê, çû- hat, çû –hat û gulp... xwe avîte tendûra gurr. Bû pirre-pirra perr û pêlasûya. Me hetanî şîş-kurxane pêra gîhand, kûtekî kerikong ji tendûrê derxist, dewsa Leka çîle qerqaş.

1971

## ÊTÎMOK

Nadik hişyar bû, veqedimî, çevê xwe miz da û xwest mîna hercar bêje:

- Inê birçîme,- lê hew dît wê Edo, xûçê, kalko, pîrikê, metê dor textê malê civyane, digirîn...

Hadik başewala xwe kevya kerevatêra berda, çû, sitûyê xwe li nav wanra dirêj kir, ka çi heye? Lê nihêrî inê ser texte razaye. Inê gişka xistiye, sûrtê pîrikê heraştiye, sûrtê metê heraştiye, xwera rehet razaye. Ewana jî digirîn, diqarin, nan jê dixwezin, ew hişyar nabe...

Wextê din bûya Nadikê inê hişyar kira, wê singê wê vegijgijanda, bigota: "Inê, inê..." û inêyê rabûya. Lê îjar dît, wekî heta Êdo, kalko jî newêrin degmîşî inê bin, ewî mîna kûsiya serê xwe tirse-tirs kişande nav qalibê xwe û paşda vekişya.

Merivê din jî dihatin, ewana jî mîna Edo gazî inê dikirin, digiryan. "Na, gişk birçîne, gişk..."- Nadik dilê xweda got û çû ber dêrî.

Li derê malê kirtê kicêc dikir, "digot-qirt, qirt, qirt", cûcikê wê gişk lê dicivyan. Nadik xwest yekê bigire, lê hê negirtibû, kirtê xwe gupevekir, "go" "kirrr" û dikûm kirê...Nadik vekişya, go:

- Ûûû, çi hêrse. Kirta qirtanok, hergê inê hişyar bûya, min zanibû gêzîk çawa dida li nav çevê te!...

Ewî terka kirtê û cûcika da û ber bi holika kûçikê çû. Zalim lêvê xwe dialastin, dêla xwe ba kir, situ xar kir û bi çevê birçî gede nihêrî.

- Li destê minda tişt tune, Zalim,...ahan,-ewî herdu destê xwe pencvekirin,- ez jî birçîme, inê hê nan nedaye min...Razaye, razaye, zanî razan çîye?...

Çiqas rind bû, wextê ina Nadik hişyar dibû. Ewê kincê wî hahanga lê dikirin, dest û piyê wî dişûştin, kerî nanê tepe jê dikir, taqe runê nivîşk li ser dixist, digirt, didayê...Paşê gêzya xwe hildida, derê malê temiz dikir. Lê Nadik li ser kursiyê, ber teva sibê rûdinişt û nanê xwe xweş, xweş dida ber geza. Digihîşt geza kutasiyê, têr dibû. Pariyê ber mayî bilind davîte kûçikê. Zalim şilape dikir, "digo" "hep" û dadibaland. Paşê Nadik bi laqirdî kevir mîna nên davîtê. Zalim ew jî hep dikir, lê dinhêrî, ku kevire, ji devê xwe davit. Nadik têr dikenya...

Lê îro...Îro bi zikê birçî, hewas jî tune laqirdiya bike.

-Inê wê kengê rabe?...Inê bû çi aqas wext?- Nadik difikire lê rê nakevê here aliyê malê , meriv tijî bûne him li hundur, him li ber dêrî...

Yêd li ber dêrî ser dara rêzge rûniştine: herçê cixarê dikişînin, herçê tizbîya. Tizbîkêşekî simêl sipî divê: "Yazî –miqedere", yê din divê: "Erê welle!" Nadik serederiyê ji xeberdana wan nake... Lê hinekî ji wan wêda du, sê merî qutîkê çê dikin, qûtîke dirêj-dirêj, mîna sirsûma. Nadik wê qutiya ecêb dinhêre...

Birçîbûn mecalê nade... Îda nîvroye, zikê wî dike qure-qurr. Ew çû, fitilekê piş malêva zivirî. Ser kevya conî qalikekî zebeşa dît, hilda, bi kirasê xwe temiz kir, kir paşila xwe, xweva qemitand. Ditirsya hinek jê bistînin... Tele-tel çû li teldê lodê, qalikê xwe derxist, bû kirte-kirta wî xar. Paşê ser kuleşê germ palda, xewa wî hat û raza...

1971

## HÊWIRZA ÇIVÎKÊ

Ez gelekî hewas dikim li nav şînkayêda li ser piştê velezim, nenihêrî wê yekê, wekî apê Hesenîk rêncberiyêda timê temî dida me: "Îzina rêncber tune li ser piştê veleze, gotî li ser zik veleze, usa fesale – gur bê, diz bê, karî zû rabî..." Vê care jî temya apo hat bîra min, lê çimku pezê min tunebû, gur û diz tunebûn ez arxayîn li nav baxê Rewanêyî "delmeda" ser piştê raketim...

Fêza minda çivîka distira, lê li rû ezmîn gultime ewir nerm sovayî dikir. Ew mîna bizineke kever bû, paşê bû mîna hespê zîn kirî, paşê civya hev bû "kalê kurmanca"...rind berawild dikim "poz-kepiyê" wîye gir, "rûdana" wî, guhkê "kumê" wîyî alîkîda daketî, mîna yê Zavitê rehmetî, kalê gundê me, wextê ser korya pêzda kûz dibû, pîşoyê kevir-hesta xûdana li bin pîlê wan dida...

Ez ketim mitalêd şîrin û wê deqa lezetîda min çevê xwe girtin, wekî ji dor-bera bêm birînê, niqoyî nava bîriyê zarrutiyê bim...

Xêlek derbaz nebû , nişkêva bû pirîna çivîkekê gîhîşt heta li ber singê min, bi ecele kire hêwirze, car dinê hilket, çû. Ez metel mam. Min bihîstiye dengê şerê çivîka, wextê didine pey hev, dikine qaje-qaj, lê eva ew deng nîbû, ne jî ew dengê hewar û zare-zarê bû, wextê me çûktiyêda ji bêfemiya xwe cûcikê wan ji hêlînê derdixistin. Eva dengekî lap başqe bû, eva carîn bû, wekî bi hêbet ji singê wê heywana çûk lez-bez pekiya: "çîv-çîv-çîv..." "Çi qewimî? Dive ser hêlîna wê velezyame?" Ez vê fikirava rabûm ser xwe – hêlîn bin minda tune bû.

Lê min hew dîna xwe dayê, merekî terikî, hema ji rex min tew dane xwe berwar fizirand. Min dadayê kevir hilda. Evê te jî çû, wek sê-çar gava binatara min gulinga şînkayîda kulokaniya xwe civand, bû mîna pesarîkî, serê xwe hilbirî û berê xwe minda kir. Ez nava têlê şînkayîra rind divînim, wekî çawa xevxevka wîye gewir fire dive, çavê wî mîna kespika diçûrisin. Hazirî şêre. Ez ji hazirim. Lê em hê zûr bûne li hev dinhêrin...qey bêjî yek hîviyêye, çika yê dinê çi dike. Min nexwest neheqî aliyê minda be. Min kevirê dest xwe rex xweda berda...Ewî jî şêkirand: dît ku min kevir avît, kulokaniya xwe vekir, û min heja şînkayêra texmîn kir, wekî ew çawa berjêr kişya, çû...

Ez cî livyam, min berê xwe hevraz kir, xwest bivînim wê çivîkê, wê heywankinga rem û zên, wekî bi hêwirza xwe eşaretî da min, ez ji mer xilaz kirim...Lê ew îda çûbû nava refê çivîkada unda bûbû...

03.10.1972

## "EZ BIRÊ ÎSAFÊ ME"

Şerê Torin, Eto ser çi çê bû?...

Bîra min nayê. Haqas bîra min tê, em şagirtên koma çara û pênca dora sobê civya bûn. Me kermê peze ziya dikire sovê, êgir li sergînê ziha digirt, dibû pire-pira wan dişxulîn. Mîna wê alavê Torin û Etem rapalikîn li hev. Birê Eto, Cemal, çû piştê. Herda bi hevra dane Torin. Eto lê dixe, li ser Cemal da dide, Cemal lê dixe, li ser Etoda dide. Li nav çevada didinê. Torinê feqîr herdu desta ser çevê xwe girtiye, mecal nakeve bigirî... Em hinek ketin navberê, hineka me jî birê Etoyî dine girtîye, wekî tevî şêr nebe.

Lê Cango xwe dicircirîne:

- Berdin, - divê,- min berdin...

- Kurê kafira,- em divên,- tu navînî birê te gede kuştin, hela tu ji dixwezî serda lêxî?...

- Na, - divê, - berdin, hela berdin- got û xwe ji destê me xist, ji destê me derket, gihîştê û... repande li herdu birê xwe.

Me tirê çevxûn bûye, xwe şaş kirye. Lê na, me dît mexsûz birê xwe dixe: ha dizvire Eto dixe, ha dizvire Cemal dixe... Em gihîştinê me ji hev qetandin. Îjar sekinîn, me xweşiyê xwe Cango dikir:

- Kuro, ne tu birê wanî, te çawa Eto û Cemal dixist?

Wî bîna xwe hilda û got:

- Ez birê îsafême...

1973

## BI DAR Û TIVINGÊ

Rojekê gur dikeve li nav birrê şivanê sovxozê Qeremanê Xudo. Rojtira din berxvanê xam bi hewas, hêbet lê dive tirik:

-Xalo can, xalo, rema xwedê bavê tebe, hela bêje gur çawa hat pezê te?

Xalo jî ne virda, ne wêda divê:

-Gur bû, hat-çû!...

Berxvan ber xwe dikeve, wekî şivanê cêribandî jêra hûrgilî qise nake fend-fesala gur, ku çawa hatiye, çawa nav pêz ketiye, çawa pez teriqye, çawa şivên berî dayê?...Lê xalê Qereman dilê xweda digazine, wekî pirsa "gurê dupe" jê nakin, pirsa cebha şeherê Kîyêvê, xafilqeda Dinêpirê jê nakin, hatine divên "gur çawa hat?", "kelb çawa ewitya"... "bizin çawa za"...

Ew berxvanê biçûk niha îda bûye malxwê mala xwe. Xalê Qereman jî îda, naçe ber pêz, emirda mezine... Lê gundiyê me hela car-carna bi laqirdî jê dipirsin:

- Te qisa gur çima Mirazra nekir?

- Na, heta ew deste kastyûmê rind minra neyne, ez jêra qise nakim,- xalê Qereman divê û vedibeşire û beşera wîra tu derc dikî, wekî gere pirsê "xam" nedî wî merivê dinêdîtî.

Naha belekiyê baharêne. Xalê Qereman pezê xweyî malê berdaye li tilm û tebilê binetara gund.

Xwexwe hilkişyaye hafa tîrikê, dest ser şivdarê kirye palik, çene sipartiyê û bi fikirê xwera çûye... Ez bi çemê çivanera ranêzîkayê pêra dikim. Ez zanim ew çi mitale dike, lema jî bi silav dayînêra jê dipirsim:

-Xalê Qereman, tu gihîştî kîderê?..

Xalo pirsa mine alêgorîk fem dike, beşer vetê.

- Bavo, welle, dive ez "gihîştime çemê Dinêpirê...

- Nikarî derbaz bî?...

- Derbazbûn rehete, xweyê min? – ew himber nîşan dide,- vir heta Elegezê beraya wî, a hinda lodê sovxozê jî mêşê sixe, faşîstê Alman navdane. Ferman tê –bikevin qeyîka, bajon wî berî, dijmin ji cî rakin! Karî? Nikarî! Tê ku bikaribî?...

Dîroka çil sisyane, tu hingê tev-hevdu zareke 9-10 salî...Tu hêvî xalê te derbazbe!... Ferman dan, me banzda qeyika,- xalo pêra weş da xwe,- em li nav avê ketin. Navketina, ku em nav ketin, wî alî bû xirmîn, avîtine me. Gullê wan tên, li rex me dikevin avê, "divên – wîşş..." Em navînin li kune, belkî em jî bavêjin. Mîna ordîya "Sixirî cin" mêşeda mina bûye û davêje. Şelpe-şelpa bêrikêd mene, em hereket dikin, her yek dixweze zû derkeve reşayê. Em dicedînin û diha ji nêzîkayê dibînin, ku çawa belgê dara ji zerpa top û tivinga dilerizin. Gavek-dudu jî, me lingê xwe avîte kenar. Em derketin kenar û carekê bê hemdî xwe me dû xwe nihêrî. Xwedê, tu nîşan nedî: Dinêpir xitxitye, kinc, kum, torbe, perçêd qeyîka, top, sandoq, cendek, werselê cendeka, xûn û xezeve pêra dikişe.Ez divêm kurmanca nave Dinêpir danîye "Dinê bir", dinê ber xwe bir, a, welle usa bû!...

...Me dîna xwe dayê taxbûra me berbat bûye, nîvî jê çûye. Lê em herçê ku mane, me top, tivingê xwe quremîş kirin û avîtêda. Wê hêla-hingirmêda balefirêd me rabûne, dijmin berawild kirine û jorda direşînin. Du seheta şerê me kişand. Yeke me, yeke wan, na, me raşikestî kir, dakuta êwira wan. Cîkî wayî kerasiye, cewek ortêra dikişe. Dar dora cewê bilind bûne, çiqilê wan hatine hev, bûne tunêl, usa li wê tunêlê ser dirêjaya çar-pênc kîlometira holik û cendekê wan raketine.

Me çendekî şûnda Kîyêv jî ji dijmin sitend. Lê axir milê min birîndar bû, heta hingê gullek pişta pilê minda "ingirye"...Ez guhastim hospîtalê. Doxtira ser min dixebite – rûseke cahile. Carekê milê min dipêçe û divêje:

- Tu zewiciyî?

Divem- Nîşan kirîme.

Divê:- Navê dergîstiya te çiye?

Divêm: - Meyaneye... rûsî –Maya...

Ew dikene, divê: - Minet meke, birîna te xeder nîne, tuyê bikarbî Maya xwe hemêzkî....

O, welle, ez qenc bûm, ez çûm derketim Çêxoslovak, Rûmîn, Bûlxar, lê "welatê" herî bedew bona min xalojina te, Meyane bû! Min axir hat, sitend, - xalê Qereman, divê û divê û dikene...

...Lê ez fikira xweda gotina cimeta me tînim bîr: "Xwedê, tu hewara hevtê du mileta bêyî, paşê hewara min" . Ez zanim, xalo hingê ev dua gotiye.

Berî şêrr, çaxê xortekî gepî zep bûye... vîlkê xwe mîna nukulê teyra gurzê gîhê xistye, gurz mîna mirîşkekê rakirye. Qîzeke tirmixçî, sufet xal-xale pêra beşerxweş bûye. Sivekê jî gundda bûye gilî, wekî Meyana Resûl Qeremanê Xudora nîşan kirin. Paşê bûye dengî, wekî faşîsta avîtye ser welêt. Dilê xort şewitiye: "wê çawa be?" Axir ewî ew mesela cimeta xwe gotye: "Ber hevtê û du miletava..." û çûye şêrr, ber malî û gundiyava xûn rêtiye û vegeryaye û dewsa tivingê dara şivantiyê hildaye.

Çil salî çûye ber pêz. Rind xwey kirye. Berî gur û diza daye, telefbûnê û çilmasiyê, hêjayî pesin û rewa bûye. Salêd dirêjda xwera tam-taş çê kiririne, bûye xweyê komî-kulfet, mal û hebûnê û îro jî dilê dînc pezê xweyî malê rapalikandye belekiyêd baharê û xwera ketye sêwir û suhbetê.

- Bavê min, her tu bê şerr tunebe!... Welle, min çar sala hêle-hingirma şêrr dîtiye û tim hewicê emirekî wayî edilî bûme...

Eskerê berê bi van xebera qisa xwe serhevda tîne û pelekî davê pêşya pêz, lê badixe. Pezê baharê qalçîçeka diçiripîne. Lê ji pêz wêda, çemê orta Pampa kurda û Çobanmazê bi "enîşka" berfê didefîne, tê bin sîya pira Nîşokêra difizirîne, dertê ber tevê, hinekî beza xwe egile dike, piştê diwerimîne, kivşî heye dixweze ber teva baharê hinekî germ be..

1974

## " Ê NE...."

Min ji xwera tam çê dikir, û şagirtê min carna alî min dikirin: hineka bi dil-ced, hineka bê dil, hineka kêm, hineka zêde, hineka baş, hineka bêbaşer: gişka alî min dikirin, her tenê yekî ( gedekî delal, xwendinêda pêş) alî min nedikir, qey bê sond xarî bû.

- Şayîsmayîl- min digot,- îro nayêyî alî min?

- Ê ne,- digot,- inker Îboyan (*hevalê Îboyan*), ezê herim ber berxa...

Ew heyamê rêncberiyê. Rêncberî xilaz dibû, lê menê Şayîsmayîl xlaznedibûn: "Ê ne,- digot,- ezê bostanê me rakim", "Ê ne, diya min, bavê min ser bûka meda çûne, kes ber mala me tune...", "Ê ne, mirîşka me kurk derxistiye, ez gere ber bisekinim, wekî pişîk cûcika nexwe"...

Carna dihat ber tamê minra diçû mala apê xwe.

- Şayîsmayîl can,-min carekê gotê,-ca were neh-deh xîbara bide ber destê min, here...

- Ê ne, go, diya min ez şandime refikê...

- Tişt nake, min gotê,- deh deqa dereng refikê bive...

- Ê ne, tendûrê sarbe, nanê here kût...

"Ev çi hesabe?"- ez difikirîm,- çira naxweze alî min bike? Dibe xwera navîne?" Lê ez zanim Şayîsmayîl kurekî êgine, aqile, û zanim, wekî qencî ji merivê aqil tê... Lema "dest yaxa wî bernadim, divêm çika " Ê ne"- yê Şalo ku disekinin?...

Rojekê jî der axlêvê, dîsa hat ber tamê minra derbaz be.

Roje xweş bû: hele-hel ketibû berfê. Keramê bûzê dihelyan, jev berdidan...Gumanê dilê minda list:

- Şayîsmayîl can,- min bi dilovanî pismamtiya me anî bîrê,- ez kurxatiyê bavê teme... Diya min û parka te xûşkê heve hepe helalin, temê dê û bavê: Cemeda Emer, Meyana Emer... Vêdiro vaye rex te, ser quniyê... ca nîîv vêdro av... nîv vêdroyê ne zêde, tê hilde bîne, ezê hine herî levxim... bîne û here...

Şayîsmayîl dagerya ber bi qunîyê...

"Kutasî, kutasî...,-ez şabûyî xwera divêm, kutasya " Ê ne" yê wî hat"... Lê min hew dî Şayîsmayîl ser quniyê pejmûrde sekiniye, çawa yekî tiştekî xwe unda kiribe...

- Hi, Şayîsmayîl can, de bîne, çira sekinîyî? – min bêsebir gotê.

- Ê ne... ê ne, inker Îboyan, av şêlûye...

- Şêlûbûn tişkî nake, seva heriyêye, her tu bîne...

- Av şêlûye, inker Îboyan,- ewî ducar kir û fizirand çû...

Min her guman ji Şayîsmayîl birîn. Min dilê xweda "sûra Çînistanê" kişand nava xwe û wî û qirar kir, wekî vir hada îda ne berbirî wî bim, ne jî pêra xeberdim....

Lê na, ez biryara xweda lez ketim: Şayîsmayîlê hela havînê here ber pêz û ezê ji, angora xeyseta xwe, hela herim xwera çol-baniyê me bigerim, li sergera Qemerdax rastî wî bêm, bêjim: "Bereket be, şivano"! Ewê bêje: "Ser çevara hatî inker Îboyan, keremke tev me

teştê bixwe"...Çi bêjim? Bêjim " Nanê nemerda naxum...", lê birçîme...., zikê birçî "merd" û "nemerd" napirse...

- Teştya we çîye? – ez vedibeşirim

- Xwedê çi kiribe qismet,- ew jî vedibeşire, tûrpaskê nîn vedike: navda penêr, nan, hêk, pincar...

Ew û hevalê xwe penêr dixun, hêka minra dihêlin. Ez du hêka bi loşekî dikime hoç û bi îştê gura didime ber geza. Çevê min û Şayîsmayîl tûşî hev dibin.

- Hi,- divêm,- Şayîsmayîl, tu sivê nayêyî alî min, em hinek herî levxin?

Ew vedibeşire...

Wê şûnda mera bû edet: ez ku rastî wî bihatama, minê bi laqirdî bigota: " Hi, Şayîsmayîl can, sivê nayêyî alî min?",-ewê vebeşirya.

Usa min digot, ew vedibeşirî... Heta vê bahara çûyî: min îda ber tamê xwe rê çê dikir. Hevt sal derbaz bûbûn, çi ku min dest bi çêkirina tam kiribû. Şayîsmayîl jî îda bûbû xortê hivde-hijde salî. Rojekê jî li sivdera mektebê min ew dît.

- Şayîsmayîl?

- Çîye, inker Îboyan?

- Ez xwera rê çê dikim...,- min giliyê xwe tam nekir, mîna wî merivî, yê ku dixweze bêje: " Gidî, ez bextê teme, kutasî mervatiya xwe unda neke..."

Şayîsmayîl deqekê xwe tivtivand û nişkêva bi dengekî esas got:

- Ê, çira nayêm, ezê bêm. Ezê bêm, lê tenê, inker Îboyan; îro şuxulê min heye, ez îro nikarim bêm, sivê ezê bêm tera bixevitim...

- He, he, he,- ez kenyam,-ew jî,-min go,- caweke tezeye, "iro na, sivê?"..

- Na, ezê bêm, inker Îboyan...

Min bengizê wîda gonekî eseqirariyê texmîn kir. "Hokumdilla hukumê tera, ya rebilalem,- ez dilê xweda dua dikim, tu heta sibê min û Sayîsmayîl xweş bihêlî, ez sibê bivînim, çika ewê çawa bê, çawa minra bixevite..."

Û hat, sibetirê Şayîsmayîl hat alî min.. Dixwezî bawer ke, dixwezî bawer neke: Şayîsmayîle... bejin bala wîye, beşera wîye... Ez mexsûz milê wî diqurincînim, wekî dengê wî jî bibhêm... Û dengê wî tê:

-Wî..wî... wî, inker Îboyan, te milê min peritand.

Ez înamîş divim, wekî Şayîsmayîle û xevatê dispêrimê.

Û Şayîsmayîl dixevite, ne rojekê, sê-çarekî minra dixevite, û çawa dixevite... usa terbet, usa bi dil û ced, wekî li nava temamya tarîqa (*dîroka*) çêkirina avayê minda, tu şagirtê min usa bi lezetî alî min nekiribû...

Em çêkirina rê xilaz dikin.

- Îda tişt maye, inker Îboyan?- Şayîsmayîl ji min dipirse.

- Were vira,- ez jêra dibêm,-tiştek jî maye Sayîsmayîl can.

Ew tê, ez hişkem destê wî digirim, berê wî şemsda dikim.

- Tu li wî şemsê hanakî, wekî kal-bavê me berê xwe pêda kirine, tuyê minra bêjî, te heta nahaka çira alî min nedikir?

- Ê ne... inker Îboyan,-ew gilyê xwe tam nake û serê xwe berjêr dike.- Ê ne wê salê ber hevala dilê min ketî,- dibêje û vedibeşire.

- Ay, "ê ne"-a, "ê ne"-aaa,- ez xeberê wa dirêj dikim û teze ez û kurê kurxatî bi dil û ced hevra dikenin...

1980

## GURÊ PÎR

Gurê havînê hewcê rewira nabe. Başqeye rozgara zivistanê: wî çaxî kerî, sûrî ji çiya, banya kês-vês dibin. Gurra dibe qitilixî... Ew hingê hazire seba kêwrîşkekê xwe zang û zinarada bavêje, pey çivtîna mişkekî bixirpişe binê şepê, ser çivîkeke yê himberê xwe berbatke.

Lê ev gurê ku ez dibêjim, bin teva hezîranêda, li keloşkê navbera çiyayêd Qemerdax û Bêfesal ketibû pencê, qulik-pirik bîn dikirin, çika belebanekî nagire, yan- meregîskekî, yan qe na, çekulcekî ji wan cekulcê berrojaye xurtik, de ewqender birçî bû gur...

Xwedê, ku yekî distîne –her alîva va distîne: çiriya çûyîda bû, gurê gewraxî sere, cara paşin kete şerrê ser dêlegura, belkî xişîmeke delal ji nava peraniyê xwera başqeke... Lê ewî taba gurêd gênce çeleng nanî. Bi emirê muhbetê der ma, ji wê lezeta tebiyetêye here xweş... Lê ziyana yaşê mezin tenê miqûfya muhbetê nîne. Pirsa nêçîrê jî cetin dibe.

Bêyî muhbetê yole çûyîn dibe, lê bê xarin nabe.

Ay, eger dêlegura wî hebûya, hizkî bira hema koteke waramayî bûya, wê vê sibê li pişta Qemerdax alîkîda pez bisilikanda, kelb û şivan pey xwe bibirana, aliyê dinva kopek wê zanibiya çi dikir... Lê ewî ancax ji tûmê jorê xwe şûlikand newalê, dêla xwe nerm hejand,

wekî kavirra li nav tûmê sêbelgokêda diçêrya, fikira neke, lê nişkêva bû pişkîn û pêz herikî...

Hêwirza şivîn û kûçika tev hev bû. Xelo, xilaz!.. Gur şeqalêra hevraz revî. Heta herdu gurêxê hirçîn berawild kirin, îda êpêce erd ketibû orta wana.

Debê birçî ranêzîkayî hêsûya çiyêra kir, sekinî, dû xwe nihêrî – kelb îda pey wî nediçûn. Ew lezekî ser dêla xwe ket, paşê rabû, dor gujmerra fitil da, xwe da wî rûyê çiyê... Pêla bêrra bîna dêwêr gûjilî hat. Ewî xwe gîhande ber keloşk, cîbicî teliya. Gerra binatarêda fîşîna garanê bû, çêrê şîn vedirût. Mozeke reş ji garanê firq bûbû, fêzêda diçêrya. Lê aliyê gerêyî çepê du zilamokê hûr çok veda bûn, kêr erdêda dinikandin. "Tu dexelya dikî",-yekî milê yê din vedigijgijand.

Kete bîra gur, çawa wextekê cewirikê wî usa bi heyr û hucet pesariyara, yan qote hestûra dilîstin... "Tifalin",-gur derheqa gavanada "fikirî" û dîna xwe da mozikê. Deqekê ewî mitale kir, wekî çawa bi bayê birûskê xwe davê zikê mozikê, zikê wê derbêra diqelişîne û cegera nerme xizirok hûfî xwe dike. Ax, tenê hinekî jî nêzîk bibûya...

Qarqarkekê jorê çerx vedida. Siya wê ser mozikêra şûlikî, mozik zivirî, berbi naxirê livya. Gur taba xwe ne anî. Ewî xwexwe jî texmîn nekir çawa mozikêra tevayî şiqitî nava naxirê... Te tire erd hejya, kevir û zinar ser hevduda xuricîn. Bû orre-orra dêwêr, xwerra-xwerra dikûm kirinê.

Ji çevêd çêlekaye fitiqî, zimanêd wane derxistî hever bûyî, gur mina topa fûtbolêye vîalî-wîalî lêxistî, çivane da xwe û ji nava naxirê fistiqî, derket...

Kêleka wî dişewitî, çawa ji gezgezkê. Ew dewsa qoçê noginekê bû...Vizîna mêşa bû, li birîna wî diquricîn. Ewî hêrsana dev davit mêşa. Lê dewsa wan anîzazêd bêebûr kurîke, pûrta kevin diranê wîva dimûçikî...

Ji birînê bêtertir birçîbûnê ew dihingavt. Lê bûbû qîyamet, tiştekî li rû erdê xanê nedikir. Gur berê xwe da Bêfesal. Ew gihîşte wêderê, kîderê zinarê qoq sekinî bû, mîna şivana. Lê binya zinêrda xişirge bû,- çawa kerî pezê gewir.

Ewî dora zinêr bîn kir, serê xwe hevraz kir, li bilindaya zinêr nihêrî, paşê hinekî hevraz çû, jorda bayê bezê hat. Banzdana wî ew ragîhande heta bedena zinêr. Ewî bi pencika xwe bi kêlê kêvirva girt, weşa dudara derkete tepa zinêr. Mîna dêwê balte li qêf ketî, tepa zinêr felq bûbû. Tûmekî şîlanê rehîşkê xwe xirpişandibûn wê qelşê. Ber siya

tûmda hêlînê gewir dikir. Sê serkêd teze pirç pêva hatî ji hêlînê bilind bûn. Bû çîve-çîva wan, devê xwe vekirin bi wî temî, wekî maka wane nukulkêrr wê niha sihorekî, yan beqekî nermik veçire, perçe-perçe bide wan... Gur fesal nêzîk bû, devê xwe avîte serê ya here qişt-qişto, hilqetand, cendekê wê nava lepê xweda girt. Herduyê dinê bîna xirab hildan, xwe ji hêlînê avîtin derva. Seva ewana ji zinêrda nekevin, debê beter cûcika girtî hanga bin diranê xweda pelçiqand, rahiştê, herdu jî bin lepê xwe rapêç kirin.

Teyrê dê û bav wê rojê êpêce ji hêlînê dûr ketibûn –mezîla deh, donzde kîlomêtira. Ewana danîbûn kenarê hezeka binatara eylê, guhê xwe pînc kiribûn, çika kî alî qûrîna beqa tê... Qey bêjî nêzîk, zef nêzîk, çar gava wêda teyra mak hêwirza cûcika xweye nuxuriye bedensipî bihîst. Ew xwe xurdilî, perê xwe li teyrê nêr xist, quloz bû hewê. Yê nêr da pey...

Ewana heta ranêzîkayî hêlînêra kirin, gur perkê cûcika paşin ji kêleka devê xwera davit... Bû carina teyra mak. Yê nêr perêd xwe civandin û xwe mîna kevirekî jorda avît, kêleka gur xist. Gur zinêrda ket, hanga banzda ser xwe. Qirş-qala pişta wîva girtibûn. Wext nîbû xwe dawşîne. Ew berwar, ber bi gêdûkê revî. Teyr da ser. Xwe davîte qafê wî, dixwest çevê wî derxe. Lê gur lê dizvirî, hilpark dibû, bi dirana dikire çeqînî. Qey bêjî digot: “Here, yan na ezê te jî têkim roja cûcikê te!” Teyr heta dibûrê çîyayê “Qûça” pey çû, vegerya ber bi zinêr. Teyra mak qincilî, perê wê daketî, dikire pûre-pûr. Bavê cûcikêd îda tune serê xwe xirpişand nava pûşê hêlînê û kire qûrte-qûrt. Te tire digot: “Kanên, kanên, kanên?...”

Paşê ewî hine pûş avîte ber nukulê xwe, mîna pêz cût. Çend cara usa kir, paşê nêzîkî teyra mak bû, kire wîre-wîr û serê xwe bin sitûyê wêra bir-anî. Deqekê şûnda, ewana firîn, danîn nav şova binatarê, wekî mîna dilê wan reş bû...

Lê gur gihîşte çevkanya Dibûrî, av çelipand û xwe berwar berda. Çû, wekî qefeke keviraye kerasîda rojekê, duda bitemije, heta birîna wî qalçik bigire, mêş-mor wî aciz nekin...

1990

# FERHENGOK

**Avtor**- (rûsî) xudan, nivîskar
**Bêfesal**- navê çiyakî li rex gundê Sîpanê
**Cimet**- gel
**Çobanbaz**- navê gundekî kurdayî li Ermenîstanê (naha navê gund Avşêne)
**Dersdar** - mamoste
**Dersxane**- pol
**Dibûr, Dibûrdax**- nave çiyakî li rex gundê Sîpanê.
**Dinêpir**- çem li Ûkrayînayê
**Egrîdax** – çiyayê Masîs
**Hevtêmanat** - nave çiyakî li rex gundê Sîpanê.
**Hobeliyar**- mirov, ku sala sersala wîye
**Hospîtal**- nexweşxane bona eskera
**Kîyêv**- peytextê Ûkrayînayê
**Mekteb**- dibistan
**Pamp, Pampa kurda**- navê gundekî kurdayî li Ermenîstanê (naha Sîpan), gundê ji dayîkbûna Fêrîkê Ûsiv (s.1934-a)
**Poêm**- destan
**Poêt**- helbestvan
**Qemerdax**- nave çiyakî li rex gundê Sîpanê
**Sîpan** - gundê jidayîkbûna Fêrîkê Ûsiv
**Şayîr**- helbestvan
**Şiyêr** - helbest
**Tercime** – welger
**Tûnêl**- Riya bin erd
**Ulim**- zaniyarî
**Ulmidar** – zaniyar
**"Ûsivê Nevya"** – destane, ku Fêrîkê Ûsiv nivîsiye
**Varpêt** – (ermenkî) hoste, helbestvanê ermeniyî mezin Avêtîk Îsahakyanra (1875-1957) digotin Varpêt.
**Xopan**- qirac

# NAVEROK

Derheqa Fêîrkê Ûsiv da ........ 4

**HELBEST**
Pampa min ........ 7
Kurê minra ........ 8
Kurdistan ........ 8
Cimeta min ........ 9
Ez û cimet ........ 9
Mistefa Barzanîra ........ 10
Kurd xerîbdoste ........ 11
Hecîyê Cindîra ........ 11
Dinihêrim ez dayka xwe ........ 12
Dayîk û tendûr ........ 13
Bahar ........ 13
Bahar vebû ........ 14
Zefî hiz dikim ........ 14
Êvara adarê ........ 15
Bahare ........ 16
Adar ........ 16
Dewata tebiyetê ........ 17
Hewa xweş bû ........ 18
Dara baharê ........ 19
Dîsa gulan ........ 20
Çiyano ........ 21
Çingilêd çiyê ........ 21
Êvar ........ 21
Ez xwey dikim ........ 22
Vê êvara dînc û kerr ........ 23
Sirsûmê diya mine ........ 23
Teva sore ........ 23
Ezmanê bi steyr ........ 24
Elegez ........ 24
Gelî çiya ........ 24
Esirê mînanî dayîka dergûş ........ 25
Payîza geş ........ 26


Wextê dagêrêye ....26
Wextê beranberdanêye ....28
Bager ....28
Beranê qerqaş ....29
Qulingêd berriyê ....30
Çiyayêd payîzê ....31
Carekê jî hildim ....32
Zivistan ....32
Siva zivistanê ....33
Ax, çivîkêd çûktiya minin ....34
Kalikê zivistanê ....34
Edilî bîna bagerê û bê ....35
Dêwê sipî ....35
Berf ....38
Îşev dîsa paşila webûm, hey gidî çiyano ....38
Zarara ....38
...Ez awqa zaru hiz dikim ....39
Her berbang û şebeq ....40
Nara minra ....40
Narê, Elo û xalo ....41
Naha emê ....42
Esil ew çiye ....42
Neviya kalê ....42
Xûç û bira ....43
Dibûrdax ....44
Elegezêra ....44
Elegeza min ....45
Egrîdax ....45
Kaniya zelal ....46
Mûr-mûrî ....47
Pirs ji darê ....48
Hefa gêlî ....49
Diçim ez ....49
Xalê min ....50
Kanê ew dîdem? ....50
Çêrga kermê pêz ....50
Birrê ewira ....51
Pîrika mine rem ....52

Îşev dîsa ....... 53
Mişko ....... 54
Çêt ....... 54
Şêr û rûvî ....... 54
Rûvî û dîk ....... 55
Dûdûqûş ....... 55
Dêlik û kopek ....... 56
Hirç û qaban ....... 57
Mêş û kermêş ....... 58
Ba, berf û baran ....... 58
Çêja “Xiştê” û sova “dîn” ....... 58
Gewirê, Qorê ....... 6I
Dewlemend ....... 65
Milkedarê çevqul ....... 66
Kalê û ezrahîl ....... 67
Koroxlî ....... 68
Zerêra ....... 70
Ew “mamostê meye?” ....... 71
Ez ku mirim ....... 71

**KURTEÇÎROK**

Kurik, çiqilê darê jê neke ....... 72
Beranê “mêrxas” ....... 73
Kilam ....... 73
Çêlek ....... 74
Pezê têrxarî nerevîne ....... 75
Dayika kor ....... 76
Qafreş ....... 77
“Sala leglegê” ....... 79
Êtîmok ....... 81
Hêwirza çivîkê ....... 82
“Ez birê îsafême” ....... 83
Bi dar û tivingê ....... 84
“Ê ne...” ....... 86
Gurê pîr ....... 89

**Ferhengok** ....... 92



Tamê Fêrîkê Ûsiv li gundê Pampê (Sîpanê), ku helbestvan bi destê xwe çêkirîye.

**Berhemên Fêrîkê Ûsiv, ku hatine weşandinê**

1. Çevkanî, Yêrêvan, 1961
2. Gula Elegezê, Yêr., 1964
3. Lîrîka, Yêr,, 1967
4. Ûsivê Nevya, destan,Yêr., 1973
5. Narê, Yêr., 1977
6. Hisretdevter, Yêr., berevoka "Bhara teze" da hij 3, 1984
7. Dinya delal, Yêr., berevoka " Bahar" da, hij, 6, 1987
8. Hîveron,Stockholm, 1993
9. Hisret, Yêr.2004, paşê Êrbîl,2005
10. Destan, Yêr., 2005, paşê Êrbîl,2006
11. Ber ava gurr, bi zimanê ermenkî, Yêr. 2004
12. Bera ber derya, berevoka wergera, Yêr. 2006
13. Kerdîga kilama, dupa helbestên çapnekirî, Yêr.,2007
14. Berevoka berhema, cilda 1, Yêr., 2008
15. Berevoka berhema, cilda 2-a, Yêr., 2008
16. Berevoka berhema, cilda 3-a, Yêr.,2009
17. Pampa min, berhemên bona zarokan, Yêr., 2009